Bidestveanîna mafên neteweyî yên gelê Kurd di çarçoveya Îranek Demokratîk û Federal de

Hejmar: 96

30’ê Îlonê

Buha: 150 Tûmen

agirî

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî

Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne


## Cejna Remezanê Pîroz Be

Derketina hejmara 96 a Agirî hevdem e tevî cejna Remezanê. Em bi vê boneyê ve pîrozbahiyên xwe ên herî germ û gurr pêşkêşî gişt Misilmanên cîhanê, nemaze neteweya Kurd dikin. Bi hêviya ku cejin bibe sedema pêkhatina aştî, tebahî û azwerî li Kurdistanê û cîhanê. **Desteya Weşana Agirî**

# DR. ŞEREFKENDÎ Û HEVALÊN WÎ HATİN BİBÎRANÎN

16’ê Îlona 2008’an, 16’hemîn salvegera terorkirina rêberê navdar ê gelê Kurd û Sekreterê Giştî yê PDKÎ, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî: Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî, Humayon Erdelan, nûnerê partiyê li Almnya û kesayetiyê siyasî yê Îranê û dostê Kurdan Nûrî Dêhkurdî li bajarê Berlînê bû. Bi vê hencetê û bona rêzgirtin û bibîranîna Şehîd Dr. Şerefkendî û hevalên wî, di binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ de rê û resmeke hêja û berfireh hate lidarxistin. Rapora vê rê û resmê û deqa peyama rêberiya PDKÎ di paşkoya taybet a vê hejmara Agirî de bixwînin.

Li bajarên Rojhilatê Kurdistanê jî Şehîdên Berlînê hatin bibîranîn.



Daxuyaniya Komîteya Navendî A PDK Îranê..... 2




Mistefa Hicrî, Di Rê Û Resma Pîrozkirina ... 3




Peyamên kongreya 14’hem a PDK Îranê... 5



Bandora Xwendewariyê Li Ser Civakê... 7



Desthilatdarî 9

## Konseya Ewlekariyê Biryarnameyeke Nû Li Dijî Îranê Pejirand



Konseya Ewlekarî a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, roja şemî, 27’ê Îlona 2008’an bi komdengî ve biryarnameya 1835 li dijî Îranê pejirand û ji Îranê hatiye xwestin ku xebatên xwe ên dewlemendkirina Uraniyûmê rawestîne.

Di vê biryarnameya kurt de, baykutên nû ên xurt li dijî Îranê nehatine bicihkirin, lê ji Îranê hatiye xwestin ku sê biryarnameyên berê rêve bibe.

Biryarnameya 1835 ji Îranê xwestiye: “bêdereng û bilez soz û ehdên xwe li hember Konseya Ewlekariyê û Konseya Rêveber a Rêxistina Vejena Etomê ya Navneteweyî piraktîze bike”.

Konseya Ewlekarî a RNY ji sala 2006’an ve heta niha, sê biryarnameyên baykutkirinê li dijî Îranê pesend kirine. Di van biryarnameyan de ji Îranê hatiye xwestin ku meyandina Uraniyûmê rawestîne û bersiva pirsên lêgerên “IAEA”ê bide.

Îran zengînkirina Uraniyûmê li gor qanûnên navneteweyî mafê xwe dizane û ragihandiye ku ne amade ye ku xebata xwe ya di vê derbarê de rawestîne, ji ber ku Uraniyûma meyandî bi kêrî çêkirina çekên Nuklerî tê.

www.arsivakurd.org

# Daxuyaniya Komîteya Navendî A PDK Îranê Bi Boneya Bidawîhatina Pilînoma Duyem YA Partiyê

Komîteya Navendî a PDK Îranê, hilbijartiya Kongreya 14'hem a partiyê, seat 9:30'ê sibêdeya roja çarşem, 25'ê Îlona 2008'an, duyemîn civîna xwe a berfireh bi beşdariya hemû endamên xwe pêk anî.

Civîn bi ragihandina deqîqeyek bêdengî bona rêzgirtin ji canê paqij ê şehîdan dest pê kir. Piştre Sekreterê Giştî, rêzdar Mistefa Hicrî, derheq destûra karê civîna Komîteya Navendî ku pêkhatî bû ji hilbijartin û diyarîkirina erkên endamên Deftera Siyasî û Cîgirê Sekreterê Giştî yê partiyê, basek pêşkêşî beşdarên civînê kir. Sekreterê Giştî yê PDKÎ di basa xwe de qala erk û bernameyên partiyê piştî Kongreya Çardehem kir û ew erkên ku di vê derbarê de dikevin stûyê yek yeke endamên rêberiya partiyê, şirove kir. Rêzdar Mistefa Hicrî di axavtina xwe de li ser alîkariya organên partiyê bi armanca pêşdeçûna kar û xebatê tekez kir û qala taybetmendiyên wan organên nû kir ku dê bi organên partiyê re zêde bibin û erk û desthilata her yek ji wan şirove kir. Beşdarên Pilînomê derbarê her yek ji bas û mijaran de nêrîn û têdîtinên xwe anîn holê û bi giştî di vê derbarê de, civîna Komîteya Navendî çend rasipartî ji bo Deftera Siyasî a nû destnîşan kir.

Di beşeke din a karê civînê de, bi liberçavgirtina organên partiyê basa hejmara endamên Polîtbîroyê hate kirin û civîna Komîteya Navendî gihîşte vê encamê ku Deftera Siyasî ji 7 kesan pêk bihê. Piştre berbijaran amadebûna xwe xuya kirin û di dengdaneke azad de, endamên Deftera Siyasî hatin hilbijartin.

Li pey hilbijartina endamên Deftera Siyasî, civîna Komîteya Navendî di nav endamên Polîtbîroyê de, rêzdar **Hesen Şerefî** wekî Cîgirê Sekreterê Giştî hilbijart.

Di dawiya karê hilbijartinan de, Sekreterê Giştî yê PDKÎ pîrozbahî ji endamên Deftera Siyasî û Cîgirê Sekreterê Giştî kir û hêviya serkevtinê di encamdana erk û wezîfeyên wan de bi hêvî xwest. Pilînom nîvroya çarşem, 24'ê Îlonê dawî bi xebatên xwe anî.

**Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê**
**Komîteya Navendî**
**24.09.2008**
**03.07.1387**

# Peyamên Partî, Rêxistin Û Kesayetiyan Ji Bo Kongreya Çardehem A PDK Îranê

Ji aliyê partî, rêxistin û kesayetiyên biyanî, Îranî û Kurdistan ve, gellek peyamên pîrozbahiyê bi henceta lidarxistina kongreya çardehem a PDKÎ hatine şandin. Niha pey ve di her hejmareke Agirî de emê çend ji wan peyaman biweşînin û bixin ber çavê we xwendevanên hêja:

## Peyama PDK'ê Ji Bo Çardehemîn Kongreya PDKÎ

**Ji bo rêzdar Deftera Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê!**

**Silaveke germ û birayane!**

Bi boneya lidarxistina çardehemîn kongreya partiya we a xebatkar ve, Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, em bextewer in pîrozbahiyên xwe ên herî germ û destxweşiyê pêşkêş we bikin û silav û rêzên xwe jî raberî nûnerên kongreya we bikin.

Birayên hêja! Em piştrast in ku di vê kongreyê de û ji nêrîna hestpêkirina tewaw a we bi erkê neteweyî, niştimanî û vêc û berjewendiyên gelê me yê Kurd û hestyarbûna qonaxê niha û ji ber tîrêjên guhertinên cîhanê, we nirxandin û şîrove û dahûrandineke kûr û berfireh ji bo hemû rewşan hebe, lewra em hêvîdar in ku encamên kongreyê bername, biryar û rasipartiyên wê ên baş û jêhatî rengvedana têgihîştineke rastiyane ji bo çareserkirina pirsa gelê Kurd ji rêya aştî û pêşgirtina awa û metodên şaristanî û demokratîk be û bi gotûbêj û ji hev fêmkirinê û dûr ji hemû awayekî tund û tûj ku em li ser vê bawerê ne ev rêya dê gelan bigehînin maf û azadiyên xwe.

Her wiha em vê boneyê bi derfet dizanin ku qala pêwendiya birayane û dostane a partiya me tevî partiya we û hêvîdar û daxwazkarê berdewam û xurtkirina wan di çarçoveya berjewendiyên bilin ên me yên neteweyî bikin. Di dawiyê de jî em dibêjin Herêma Kurdistanê berhema xebat û qurbanîdana tevgera me a kurdayetiyê û cihê rûmet û şanaziya hemû gelê Kurd e, lewra parastina destkevtên Parleman, Hikûmeta Herêma Kurdistanê û cihgirbûna aramî û ewlekariyê erk û wezîfeya me tev aliyekê ye.

Êdî bi hêviya gihîştina we bi hêvî û serkevtinê.

Digel rêz û hurmatan

**Mekteba Siyasî ya Partiya Demokrata Kurdistanê**

## Peyama YNK'ê Ji Bo 14'hemîn Kongreya PDK Îranê

**Endamên rêzdar ên 14'hemîn Kongreya PDK Îranê!**

Piştî rêz û hurmetan!

Li ser navê Mekteba Siyasî a Yekîtiya Niştimanî a Kurdistanê, em pîrozbahiya xwe ya germ ji bo girtina Kongreya we dikin û em hêvîdar in jî ev kongreya partiya we a xebatkar ku di rewşeke dijwar û hestyar a tejî pêlên evraz û nişîv ên siyasî yên Rojhilatê de tê girtin, di darêtina stratejî û îdeolojiyeka demokrasiya hemdem de, serkevtî be.

Em hêvîdar in, ev guhartinên ji bo Rojhilata Navîn, di serdemê cîhanîbûnê de tên berçavgirtin, çareseriya demokratîk û aştiyane a pirsgirêka hemû beşên Kurdistanê bicî bîne.


Careke din, em hêviya serketinê ji bo Kongreya we dixwazin.

**Yekîtiya Niştimanî a Kurdistanê**
**12.09.2008**

www.arsivakurd.org

**Rêzdar Mistefa Hicrî, Di Rê Û Resma Pîrozkirina Kongreya 14'hem Ya PDKÎ De:**

# "KONGREYA ÇARDEHEM, ENCAM Û AZMÛNA KONGREYÊN BORÎ, KONGREYA 13'HEM Û HEWL Û CEHD Jİ BO GUHARTİNAN, PÊŞKEVTİN Û NÛBÛNÊ BÛ"



Piştî ku Kongreya Çardehem a PDK Îranê di navbera rojên 10-14'ê Îlona 2008'an bi awayekî serkevtî bidawî hat, roja duşem, 15' Îlonê, rê û resmeke hêja û berfireh di binkeya Deftera Siyasî a PDKÎ bi boneya dawîhatina Kongreyê hat lidarxistin.

Di wê rê û resma pîrozkirinê de, rêzdar Mistefa Hicrî, Sekreterê Giştî yê PDKÎ axavtineke girîng û balkêş kir.

Birêz Hicrî di destpêkê de bi germî pîrozbahî ji Kadro, Pêşmerge, endam û dostên PDKÎ kir û Kongreya 14'hem jî weke destkevteke demokratîk û ceribîneke dîrokî ya din a partiyê û cihê rûmet û şanaziyê tev aliyekê hesiband. Piştre got: "Kongreya Çardehem, serkevtineke mezin bû ku hemû endam û dilsozên partiyê li benda wê bûn. PDKÎ di qonaxên herî dijwar ên xwe de heta niha 14 kongre birêve birine û her yek ji wan gav û destkevtek bûne û girîngiya xwe a taybet di xebat û berxwedana azadîxwazane gelê Kurd de hebûne û hene".

Rêzdar Hicrî di doma axavtina xwe de bal kişande ser taybetmendiyeke cuda a Kongreya 14'hem ya PDKÎ û got: "Kongreya 14'hem a partiyê ji bilî ew xasmaniyên ku di kongreyên de berê hebûn, kongreyek bû ku di demeke cuda de hat lidarxistin, ji ber ku her dem û çaxekê hewcedarî û taybetmendiya xwe heye û hebûye. Lê bi giştî Kongreya Çardehem, encam û azmûna kongreyên borî, kongreya 13'hem û hewl û cehd ji bo guhartinan, pêşkevtin û nûbûnê bû ku di Kongreya Sêzdehem de hêvî û xweziya hemû me beşdarên kongrê û endamên partiyê bû. Bi sedema wan kosp û astengên ku di navbera wan du kongreyan de li ser rêya me bûn, me nekarî wan xwezî û hêvî û soz û ehdên ku me dabûn, bicî bînin. Hin xal di Kongreya Çardehem de, pirr berçav bûn. Yekem û ji hemûyan zêdetir, ruhiya dilsozî, wefadarî û fidakarî ji bo Partiya Demokrat bûn, bas û nîqaşên demokratîk û dîtin û nêrînên cuda ku têra xwe balkêş bûn, bû sedema dewlemendbûna kongreyê û bi vî awayî biryarên herî baş û jêhatî ji bo PDKÎ hatin girtin, bas û nîqaş ji bo vê armancê bûn ku nêrînên herî baş bên dîtin û bi hev re binirxînin û bikin siyaset û bernameya PDK Îranê ji bo çar salên piştî kongreyê. Di vî warî de, Kongreya Çardehem gellek serkevtî bû".

Pirseke din ku di kongrê de hate berbas, pirsa jinan bû. Beşeke xuya ji kar û basên kongreyê taybet ji bo pirsên jinan hatibû terxankirin û hemû aliyên mijarê ku di vê derbarê de hewce bûn, hatin rojevê û biryar li ser wan hate dayîn.

Ji bilî wan, bername û pêrewa hundirîn a PDK Îranê ku di rastî de qanûna bingehîn a partiyê ye û zagona herî bilind a PDK Îranê ye, xal bi xal kete berbas û biryar li ser hate dayîn.

Di doma axavtina xwe de, Sekreterê Giştî yê PDKÎ, birêz Mistefa Hicrî bal kişande ser pêwîstiya yekîtî û hewildan ji bo pêşketina kar û barên partiyê di navbera Kongreya 14-15 ku divêt ji aliyê endamên PDKÎ ve rêve biçin. Di axavtina xwe de rêzdar Hicrî basa cudabûna hinek li Kadro û Pêşmergeyên partiyê kir û afirandina rewşekê ku bibû asteng li ser rêya pêşveçûna xebat û berxwedanê û pêkanîna rewşa han tenê di berjewendiya girûpî û takekesî de bû, lê serkevtina me di Kongreya 14'hem de ceribîneke nû bû ku me dewranek ji dubendî û nakokiyan bicî hişt, ew serkevtine ji me re dibêje ku tu demekê em navegerin wê dewrana nexweş ku em tê ketibûn.

Piştre Mistefa Hicrî basa demokratîkbûna Kongreya 14'hem kir û da zanîn: Bernameyên wê kongrê bi awayekî demokratîk hatin meşandin û bi eşkere di televîzyon û ragihandinên giştî de hate belavkirin û bi milyon kesan bi çavê xwe serkevtin û nîqaş û basên kongrê dîtin û betalbûna xewn û xeyalên dijmin û neyaran li ser vê kongreyê temaşa kirin".

Rêzdar Mistefa Hicrî got: "Dema ku gel bi serkevtinên partiya me dilxweş dibe, erkeke qurs û girantir dikeve ser milê me rêberî, endam û Kadro û Pêşmergeyên partiyê. Divêt ew bernamên ku me xistine ber çavê xelkê, bicî bihên û ev yek tenê bi yekîtî, yekrêzî û fidakariya yek yeke endam û alîgirên partiyê cî bi cî dibe. Erk û wezîfeyên me giran in, divêt em vê yekê ji bîr nekin, serkevtin di wan kar, xebat û bernamane de erkê me hemûyan e".

Di dawiyê de Sekreterê Giştî yê PDKÎ got: "Ev kongre û hemû destkevt û serkevtinên berê jî, encama xebat û têkoşîna şehîdên me ên birûmet û malbatê wan in, lewra serkevtina Kongreya 14'hem ji wan pîroz be. Kongreyek ku li bere berê bîranîna şehîdê rêber û navdar Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî hate lidarxistin, lewra ruha nemir a şehîd Dr. Şerefkendî bi vê serkevtinê dê şa bibe, ji ber ku partî û şagirtên wî karîne rê û rêbaza wî bidomînin û ber bi serkevtinê ve gavan bavêjin.



www.arsivakurdi.org

**Xwendevanên hêja ên Agirî, Kongreya 14'hem ya PDKÎ di navbera rojên 10-14'ê Îlona 2008'an, hat lidarxistin. Di kongreyê de gellek biryar û helwestên girîng hatin girtin. Kongreya 14'hem 9 peyamên taybet ji bo malbatên Şehîdan, girtiyên siyasî, civatên xelkê Kurdistanê, endam û Kadro û Pêşmergeyên partiyê, Konseya Mafên Mirovan a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, Jinan, Ciwanan, Xwendekaran û Kongreya Neteweyên Îrana Federal şand. Weşana Agirî ji ber girîngbûna wan peyaman, di vê hejmarê û hejmara tê a Agirî de deqa wan belav dike.**

# Peyam Ji Bo Malbatên Şehîdan

Hevalino, xweştevîno, endamên malbatên serbilind ên şehîdan!

kongreya 14'hem ya PDK Îranê, Kongreya Geşekirin û Gelîtirkirina Xebatê, silavên germ û emegdariyê pêşkêşî we dike û li ser wê baweriyê ye ku baştirîn xelat ji bo şehîdan, domandina rêya wan e, her ji ber vê yekê ye ku beşdarên kongrê weke nûnerên endam, kadro û Pêşmergeyan û herwiha rêberiya partiyê dîsan soz didin ku rêbaza şehîdan, yanî xebat bo gihîştin bi amanc û hêviyên wan dê her bidome û ew dê bi bawerên siyasî û neteweyî yên şehîdan wefadar bin.

Eger xebata neteweyî ya Kurd di Îranê de bi beşdariya piraniya hevwelatiyan di civaka kurdewarî de birêve diçe û her kes û her aliyek bi curekê erkê xwe li hember gelê kurd û rakirina zulm û zordariyê li ser gelê Kurd dimeşîne ku cihê rêz û pêzanînê ye, şehîd weke emegdartirîn û fidakartirîn keç û xortên gel tên dîtin ku binirxtirîn sermayeya jiyana xwe yanî canê xwe di rêya azadî û mafê neteweyî de gorî kirine û wefadariya xwe bi gelê Kurd bi xwîna xwe mohr kirine. Her ji ber vê yekê ye ku şehîdan mafeke zaf li ser me hene û ji bo me serwer in.

Eşkere ye ku hûn malbatên şehîdan ji ber lidestdana ezîzên xwe, xwediyê ciheke taybetî di nav xelkê de ne. Bi taybetî ku ji bilî xema lidestdana ezîzên xwe, hûn tûşî jiyaneke pirr zehmet hatine û her bi vî awayî jî hûn li hember dujminan teslîm nabin û gellek caran hûn cihê wan ezîzan di xebatê de tijî dikin.

Bi nêrîna Partiya Demokrata Kurdistana Îranê, hûn hemû xebatkar in û bi xweragir tên naskirin û xwediyê rêz û hurmetê ne. Mixabin nebûna îmkanatan û rewşa xebatê rê nade daku PDKÎ bi dil xizmetê bi malbatên şehîdan bike û rewşa jiyana wan xweştir bike, ewa ne ji ber xemsariya partiyê ye, belku ji ber bêîmkanatî û rewşên dijwar e.

Eva ku gellek cihê rêz û hurmetê ye ev e ku we di jiyana pirrasteng ya xwe de hemû carekê hurmeta şehîdan û neteweya xwe ragirtiye, ne tenê eva belku we hewl daye ku zarokê wan şehîdan bi awayekî neteweyî perwerde bikin ku îro em dibînin ew hest bi serbilindiya şehîdan û serbilindiya xwe di nav civakê de dikin.




Kongreya 14'hem ya PDKÎ, Kongreya Geşekirin û Gelîtirkirina Xebatê, bi erkê xwe dizane ku erkekê bide rêberiya hilbijartî di vê Kongrê de ku zêdebarê nebûna îmkanatan, girîngiyeke zaftir bide malbatên şehîdan û bibe sîberek pan û berîn ji bo wan.

Serbilindî ji bo şehîdan û malbatên xemgîn ên wan

Serkevtin ji bo rêbaza pirr li serberzî ya şehîdan

**Kongreya 14'hem ya Partiya Demokrata Kurdistana Îranê**
**Kongreya Geşekirin û Gelîtirkirina Xebatê**
**Îlona 2008**

# Peyam Ji Bo Girtiyên Xweragir Ên Siyasî

**Girtiyên mafxwaz û berxweder ên siyasî!**
**Hevalên xebatkar!**

Hûn niha ku di nava çalereşên rejîma Komara Îslamî de, gewriya tejî hawara neteweyeke maflêzevtkirî û bindest in, hûn ew xetîr(mom)a ronahîker in ku dijminên ronahiyê bona berlêgirtin bi tîrêjavêtina we, bi neheq û bi dûr ji her cure pirensîpeke mirovanî, xistine wan çalereşên ku di reşiyê de, hevşeklê hundirê celad û rayedarên rejîma xwîn û cinayetê ne.

Berxwedan, rawestan û pêdagiriya we li dijî stem û tekoşînê ji bo dabînbûna maf û azadiyên gelê Kurdistanê, ji aliyekê ve kesayetiya bilind û şoreşvanî a we dide xuyakirin û di heman demê de jî, ruhiyedan û mînak û sembola xebatkarên rêya azadiya Kurdistanê ye.

Kongreya Çardehem a PDK Îranê, serê rêz û hurmetê ji bo hişyarî û baweriya kûr a we bi azadiyê ditewîne û hêvîdar e, hûn ên roj, bi xebata bêrawestiyan a hemû tex û qatên civaka Kurdistanê û bi zext û zora navend û kom û komeleyên mirovhez bo ser rejîma sedsalên navîn a Melayan, di nav wan çalereşan û ehrîmenan de bêne derê û civaka me bikare ji azmûn û roniya we mifaha hewce werbigire.

Bi wê hêviyê ku li batî girtîgeh û îşkenceyê, mîdala rêzgirtinê li sîngê we xebatkarên gelê me bihê dan û Îran ji lepên qirêj ên rejîma Îslamî ya gemar rizgar bibe û gelê me bi hemû maf û azadiyê xwe şa bibe.

Silav li girtiyên xweragir ên siyasî, momên ronahîker ên nav çalereşên rejîma Melayan

Silav li malbatên girtiyên siyasî, ruhyederên xebatkarên nav girtîxaneyan

Neman ji bo rejîma zîndan û îşkenceyê

Serkeve xebat rizgarîxwazane a Kurdistanê

**Kongreya Çardehem a PDK Îranê**
**Îlona 2008**

# Peyam Ji Bo Xelkê Kurdistana Îranê

Civatên xelkê Kurdistana Îranê!

Kongreya 14'hem a PDK Îranê, Kongreya Pêşdeçûn û Xelkîtirkirina Xebatê, silavên herî germ ji bo we xelkê Kurdistana Îranê dişîne û serê rêz û emegnasiyê li hember berxwedanî û îradeya bilind û qahîm ya we bona domandina xebat û berxwedaniyê li hember siyaseta tepeserî û zulm û zora Komara Îslamî di Kurdistanê de ditewîne.

Dîroka tejî şanazî û cangorîtiya bizava millî-demokratîk a gelê me di Kurdistana Îranê de vê rastiyê diselimîne ku hûn civatên xelkê Kurdistanê, hertim piştevanê vê bizavê bûne û givaş û tepeserkirinê nekariye û nikare we ji helwesta neteweyî û şoreşvaniyê dûr bixe. Ew xwenîşandan, girevgirtin û bizava giştî ku we îsal di salvegera şehîdkirina Dr. Qasimlo de, anku di 22'ê Pûşperê de meşand, carek din ev rastiye da selimandin ku siyasetên Komara Îslamî di Kurdistanê de şikest xwarine û rejîma Komara Îslamî xêncî hebûna xwe ya leşkerî û polîsî, tu cih û pêgehek di nav dilê civatên xelkê Kurdistanê de tune ye.

Kongreya Çardehem a Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê, bi nirxandina rewşa siyasî a hundirîn û navneteweyî û bi liberçavgirtina guhertinên siyasî yên Îran û deverê û herwiha bi baldan bi vê rastiyê ku Komara Îslamî a Îranê ne karîna bersivderiyê bi xwest û daxwazên rewa yên gelê Kurd û gelên din yên Îranê heye û ne jî dikare guhartinê di naverok û kakila totalîter û paşverûtiya xwe de pêk bîne, carek din jî li ser domandina xebat û tekoşîn bona bidestvexistina mafên neteweyî yên gelê Kurd û cihgirkirina demokrasiyê li welatê me tekezê dike.

Diyare pêşmerca misogerbûna van daxwazane jî hiloşandin û ji holê rakirina rejîma Komara Îslamî bi tevahî ye.

Eyan e ku karê han bêy xebatek berfireh û xelkî di hemû astên xwe de ne mimkin e. Lewra Kongreya Çardehem a PDK Îranê bi îsrar e ku kar, biryar û sipartiyan ku hemû hêz û şiyanên partiyê û tevgera azadîxwaziyê bona xizmet bi pêkanîna delîveya zêdetir ji bo pêşdeçûn, rêxistin û parastina wê xebata giştî û gelî ne, birê bixe.

PDK Îranê di xebat û tekoşîna bi zehmet û dijwar a xwe de, rêyek dûr û dirêj meşandiye, ceribînên zaf hene û di sobeya xebat û berxwedaniyê de qeliyaye. Gellek caran ketiye ber pêlên pîlan û komployên cur bi cur yên dujminên gel û tevgerê. Lê tu car ala xebata rizgarîxwazane ya xelkê Kurdistanê nevî nekiriye û qada xebatê vala nehiştiye. Ya ku PDK Îranê di vê qada dijwar û bi zehmet a xebatê de cihgîr hiştiye, eva ye ku vê Partiyê li hemû rewş û zirûfekê de pirsa xwe bi gel û kela qahîm a xelkê Kurdistanê girêdaye û îlham ji xebat û armancên siyasî yên wê wergirtiye.

Kongreya 14'hem a partiyê, carek din jî soz û peymanê dide we ku di pêşerojê de jî herwekî berê, hizba me dê her siwarçakê qada xebat û berxwedaniyê bimîne û dê ala xebata millî-demokratîk a xelkê Kurdistanê wekî berê bilind û çeqiyayî rabigire.

Diyar e di vê rêya dijwar û li birêvebirina vê erk û wezîfeya giran û mezin de, ku erkek netewî û nîştimanî ye, hewcehî bi piştevaniya we tev aliyekê heye.

Bila em hemû bi hev re û di hemû war û astekê de bona pevregirêdana metodên cur bi cur yên xebatê û xurt û berfirehtirkirina tekoşîn û berxwedana rewa ya gelê xwe, dest bixin nav destê hev û tev hêz û şiyanên xwe bixin xizmeta vê armanca sereke. Bi hêviya serketinê! Ber bi pêş

**Kongreya 14'hem a PDK Îranê**
**Îlona 2008**

# Peyama Ji Bo Konseya Mafê Mirovan A Rêxistina Neteweyên Yekbûyî

Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê li gor rêbazên xwe yên demokratîk û bawerî bi bingehên demokratîk, her 4 salan carekê heta di dijwartirîn rewşê de, kongireya xwe lidar dixe.

Vê carê PDK Îranê, 14'ehemîn kongireya xwe di demekê de pêk tîne ku rejîma Komara Îslamî a Îranê bi awayekî bê mînak êrîşê dike ser azadiyên demokratîk û bi awayekî sîstematîk mafê mirovan bin pê dike.

Di vê navberê de netewa Kurd ji hebûna kêmtirîn mafên xwe yên siyasî, mirovî û çandî hatiye bêparkirin. Heta xwandin bi zimanê dayîkê ji netewa kurd re hatiye qedexekirin û Kurd ketiye ber êrîşa dezgehên bi nav dadwerî û dezgehên tepeserkar yên rejîma desthilatdar li Îranê.

Îro rojê di Kurdistana Îranê de xebata sivîl a rewşenbîran û çîn û qatên civaka Kurdewarî, bona bidestxistina azadî û mafên siyasî û sivîl dom dike.

PDK Îranê weke hêza sereke a Kurdistana Îranê bi hebûna derbazbûyeke 63 salî ji xebat û tekoşîna xwe di pêxema serbestî û mafên berheq yên netewa kurd di çarçoveya Îranê de, herdem tekez li ser vê rastiyê kiriye ku Îrana pirrnetewe, tenê ji rêya demokratîkkirin û dabînkirina mafên netewî û mirovî yên netewên bindest li Îranê di sîstemeke demokratîk û federal de dikare dawiyê bi dîktatorî û terorîzma dewletî a Komara Îslamî ya Îranê bîne û mafê mirovan biparêze û bibe sebebê dabînbûna ewlehiyê di herêma Rojhilata Navîn de.

Çend sal e ku seba hebûna pirsa çekên Etomî ên Komara Îslamî ya Îranê tevî civaka navnetewî, gellek girîngî bi pirsa mafê mirovan bi giştî û binpêkirina rojane ya mafên netewa Kurd bi taybetî nahê dan.

Em her di wê demê de ku seh bi metirsiya gihîştina Komara Îslamî bi çekên Etomî dikin, lê li ser vê baweriyê ne ku bêdengiya civaka navnetewî di asta tepeserkirin û binpêkirina mafê mirovan li Îranê, ne tenê nebûye sebebê sekinandina pêvajoya bipêkirina mafê mirovan, azadîxwazan û çalakên siyasî li Îranê, her wek ku ev yeka di heyamê 2-3 salên borî de hate îsbatkirin jî, belku nekariye rejîma Îranê neçar bi qebûlkirina daxwazên civaka navnetewî derheq pirsa çekên navikî jî bike!

Netewa kurd û PDK Îranê daxwazê ji Rêxistinên navnetwî yên parêzerên mafên mirovan û Konseya Mafê Mirovan a ser bi Rêxistina Netewên Yekbûyî dike ku bê liberçavgirtina berjewendiyên xwe yên aborî û siyasî, Komara Îslamî a Îranê bixe bin zext û givaşan, da ku vê rejîmê neçar bi sekinandina pêvajoya îdamkirina xebatkarên Kurd û azadîxwazên Îranê bike û rêz ji mafê mirovan bigire.

**Kongireya 14'hem A PDK Îranê**
**Îlona 2008**

www.arsivakurdi.org

## Peyama Enistîtuya Kurdî ya Brukselê Ji Bo 14'hemîn Kongreya PDKÎ

**Xusro Ebdullahî**
Berpirsiyarê Buroya pêwendiyên navneteweyî yê PDK-Î

enstituya kurdî ya brukselê

Min vexwendina we ya ji bo Civîna Giştî ya PDKÎ stend. Ez ji dil pîroz û serfiraziyê ji we re hêvî dikim.

Rêzdarên hêja, berpirsiyar û endamên PDKÎ û beşdarên bi rûmet, min gelekî dixwest di vê roja qedirbilind de beşdarî vê civîna we ya giştî bikim. Lê mixabin ezê nikaribim. Pirr xemgîn im.

Her çende nikarim beşdar bibim jî, dilê min bi we re ye û ji we re mezintirîn serketin hêvî dikim.

Weke birayekî we yê piçûk û saziyeke Kurdistanî ji Civîna we ya Giştî hêvî dikim ku hun her derfetê xwe ji bo yekbûnê pêk bînin.

Ez û Enistîtuya Kurdî ya Brukselê hertim di xizmeta Kurdistaniyan de ne. Eger tiştek hebe û li me bikeve, di çarçewa derfetên xwe de, ser seran ser çavan pêk tînin.

**Derwêş Mihemed FERHO**
**Serokê Enistîtuya Kurdî ya Brukselê**
**Bruksel, 08.06.2008**

## Ji Bo Partiya Demokrata Kurdistana Îranê

Hevalên Delal,
Hêvî û daxwaz dikim ku Kongira we ya 14'an bi serkevtin derbaz be, ji bo karên partiya we û ji bo azadiya



© Arif Zêrevan

gel û welat biryarên delal bistîne.

Ji hemû beşdarên Kongirê û hemû hevalên delal yê PDK Îranê ra silavên germ.

**Kemal Burkay**
**29'ê Hezîran a 2008**
**Stokholm**

## Şiroveya Peyvên Siyasî



**Berhevkar: Omîd Esxeran**
**omid_anbi@yahoo.com**

# ANARŞÎZM

Têgiha Anarşîzm ji peyva Yûnanî a "Anarkia" ku tê wateya bêserweriyê, û bi giştî bi wateya nebûna rêberî û hikûmetê ye. Di kar û barên siyasî de, ji teoriyekê re tê gotin ku li dijî her cure desthilatek siyasî ye û di warê qatî ve jî hez û xweziya borjuwaziyê tê de tê xuyakirin. Têgiha han ji ber teoriya xwe a parvemayî ve dibe asteng li hember pêşketina civakê.

Anarşîzm, yasa û zagonan weke çavkaniya tim gendelî û xirabiyekê dizane û di hemû zirûfekê de hebûna dewlet, partî, teoriya siyasî û bernameyên pêşxistinê bi nerewa dizane. Hizra han li ser vê baweriyê ye ku hikûmet dibe sedema gendeliya xelkê û kasayetiya mirov bin pê dike û wê wek astengek li hember pêşketina mirov dizane.

Anarşîzm wiha dihizire ku yasa û zagon li dijî eqil in, çunku mirov bixwe canliberek civakî û azad e û hewcehî bi yasa û dewletê tune ye û gerek saziyên dewletî ji holê werin rakirin û her wiha xizmeta leşkerî û wergirtina bacê jî werin hilweşandin. Anarşîzm daxwaza vê çendê dike ku kar û barên aborî di civakek bêyasa û dûr ji her cure tengasiyekê de birêve biçin.

Di rastî de alîgirên Anarşîzmê li dijî her cure bizav û tevgerek şoreşgerane û hizbî ne. Li gor nêrîna wan, eva ji ber vê çendê ku meriv serbest û azad e û tenê kiryarên takekes cihê pesendê ne. Gişt xebatên tex û çînî û kiryarên bikom di her şekil û metoekê de be, ji aliyê Anarşîstan ve tên redkirin û dewsa wê cudahî, dubendî û paşayetî, bi rewa dizanin.

Lenîn li ser vê baweriyê bû ku Anarşîst dixwazin texa kedkar stûxwarê sermayedaran bin û derheq çewisandinê jî, bê vê çendê ku bingeh û sedema vê bizanin, hin tiştan dibêjin û tucar bawerî bi xebata çînayetî nînin. Hêjayî gotinê ye ku hin anarşîstên tundrew, bawerî bi avakirina paşayetî, tevlîhevî, teror, girevên giştî û hiloşandina sîstema desthilatê, jî hene. Tirsa bihêzbûn û xurtbûna hizra anarşîzmê di nav hûreborjuwaziyên gund û bajaran de gellek zaf e.

**Çavkanî: (Ferhengî Ramiyarî Nîga) Azad Weledbegî**
**(Danêşnamêyê Siyasî) "Politicial Dictionary"**
**Daryûş Aşorî**

www.arsivakurdi.org

16'ê Îlona 2008'an 16 sal bi ser cinayeta terorîstî a rejîma Komara Îslamî li dijî rêberê gelê Kurd û Sekreterê Giştî yê PDKÎ, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî li bajarê Berlînê derbas dibe. Di 17'ê Îlona sala 1992'an de, bi fermana rayedarên rejîma Komara Îslamî a Îranê, li xwaringeha Mîkonos li bajarê Berlînê Dr. Şerefkendî û 3 hevalên wî hatin teror û Şehîdkirin û piştî 5 salan kar û xebatên dadgeha serbixwe a Almanyayê, di biryara wê dadgegê de, rêberên payebilind ên Komara Îslamî weke rêveber û fermanderên vê cinayetê hatin nasîn. Em wan şehîdên serbilind û birûmet bibîr tînin.

**Desteya Weşana Agirî**

Paşkoya Taybet Bi Boneya 16'hemîn salvegera Terorkirina Dr. Şerefkendî Û Hevalên Wî — Hejmar: 96

# Peyama Rêberiya PDKÎ Bi Hinceta 16'hemîn Salvegera Şehîdkirina Dr. Sadiq Şerefkendî Û Hevalên Wî Li Berlînê

**Xwîşk û birayên rêzdar!**
**Hevalên hêja û delal!**

Îro 26'ê Xermanana 1387(16.09.2008)'an a Rojî, 16'hemîn salvegera teror û şehîdkirina **Dr. Sadiq Şerefkendî**, Sekreterê Giştî yê PDK Îranê, **Fetah Ebdulî**, endamê Komîteya Navendî û nûnerê wê demê ê partiyê li derveyî welat, **Humayûn Erdelan**, berpirsiyarê partiyê li Almaniya û **Nûrî Dêhkurdî**, dostê dêrîn yê PDKÎ ye. Di sala 1992'an de, di dereng wexteke roja 17'ê Îlonê de destê teror û pîlana rejîma Komara Îslamî li cihekê ku ezîz û xweşteviyên me li Berlînê, tevî hejmarek ji kesayetiyên naskirî ên Opozîsyona Îranê civiyabûn, gihîşte canê wan ezîzên me û bi meşandina wê komplo û terorê ku ji aliyê Komara Îslamî a Îranê ve hatibû darêtin, jiyana xwe ji dest dan. Bi vî awayî di rewşekê de ku hêşta ew birîna qurs û giran ku sê sal û du mehan berî wê bûyerê, ketibû ser cesteya PDKÎ û ew birîna ku bi bandor bû, birîneke din û derbeke din a giran ji partiya me ket.

Dr. Sadiq Şerefkendî kî bû? Taybetmendiyên wî çi bûn? Hewl û tekoşîna wî çi bû? Ku ew bi vî awayê diyarîkirî kiribû armanc ji bo terorîzma dewleta Komara Îslamî. Dr. Şerefkendî heval û xebatkarekî demokrat bû ku piştî teror û şehîdkirina Dr. Qasimlo, bi cehd, hewldan, sadiq û pakî û jêhatîbûn û karîna xwe, di halekê de ku bîr û dilê wî bi xema mezin a ji destdana mamostayê xwe, Dr. Qasimlo dagirtî bû, bi wî halî jî, pêşengiya tevgera Kurd li Kurdistana Îranê ku di destê PDKÎ de bû, girte destê xwe. Dr. Şerefkendî bi curekê ew partî di rêya rast û bi yekrêzî û bi tekoşîn û xebata berçav a xwe pêşde bir ku rejîma Komara Îslamî tê gihîşt tenê bi terorkirina Dr. Qasimlo, armancên sereke ên xwe ku ji nav birina tevgera Kurdistanê û tunekirina PDKÎ bû, bi hebûna kesayetiyekî wekî wî cîbicî nebûye, yan aliyê kêm ne kemiliye. Lewra Dr. Sadiq Şerefkendî bû armanca rasterast a terorîzma Komara Îslamî. Birêveçûna wê pîlanê û ji destçûna kesayetiyekî herî berçav yê PDKÎ, Dr. Şerefkendî ji bo hemû xelkê Kurdistanê û ji tev azadîxwazan çi li hundirê welat û çi li derve re xem û kovaneke mezin bû. Lê piştî terorkirina Dr. Şerefkendî jî derket holê ku ew partiya ku Dr. Qasimlo ji destê Pêşewa **Qazî**



**Mihemed** wergirtiye ku avakerê wê partiyê bûye û ser li nû rêxistin kiriye û li pey wî jî Dr. Şerefkendî jî ala wê bi destve girtiye, bi derbên wisa qurs û bi jidestdana mêrxasên bi wî awayî jî û heta wê radeyê jî, birîndar dibe, lê qet teslîm nabe, ji nav naçe û bi kiryar û piratîk ew hêviya ku Komara Îslamî jê re pîlan û komplo rêtibû, bicî nahê.

Ji ber ku rejîma Komara Îslamî dît piştî Dr. Sadiq Şerefkendî jî, rêvîngên emegdar û derslêfêrbûyî ên mekteba Pêşewa Qazî, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî, çiqas gurs, qahîm bi yekrêzî û rêberîkirina bikom mil yê dane ber erkeke wisa mezin ku di nebûna wan de divêt birêve bibin. Eva taybetmendiyeke berçav a PDKÎ ye. Renge heke PDKÎ bi hemû wan taybetmendiyane neba, yan hêzeke din bi hin xisletên din hebaya û derbên wiha bi jan giran û lê ketiban, birîneke wisa giran û kûr hilgirtiba, reneg nekarîba li ser pêyên xwe bisekine. Renge nekarîba yekparçeyiya domandina xebatê biparêze û li ser xebat û berxwedanê berdewam be. Lê partiya me di hemû wan ceribînane de serbilind hate derê.

Terorkirina Dr. Sadiq Şerefkendî û ew dosya ku bi navê cihê bûyerê, bi Mîkonos bi nav û deng e, berevajî dezgeha Dad a Otrîşê, dezgeha Dad a Almanyayê micidtir û mikumtir pirs şopand û heke ez nebêjim bi tevahî, dikarim bibêjim pirr kêmtir kete bin bandora dan û standinên siyasî û pêwendiyên dîplomatîk û bazirganî ên Almanya bi Komara Îslamî a Îranê re. Dadgeke dûr û dirêj, bi girtin û amadekirina tawanbaran di dadgehê de, tevî hemû wan hewl û cehdên ku Komara Îslamî dan, serbarê hemû ew poen û îmtiyazên ku hazir bû bide Almanya, bona ku aliyê kêm heke encama dadgehê jî were ragihandin, di çaçoveya hinek tawanbarên ne Îranî de bihê berteskkirin û navê rêber û pîlandarêjerên Komara Îslamî a Îranê tê de nehê anîn. Lê dezgeha dad a Almanyayê û hewl û cehda parêzeran rê neda ku wê carê jî weke berê, xwîna azadîxwaz û xebatkarên Kurd bibe goriyê dan û standinên bazirganî û hinek alvêrên dîplomatîk û siyasî. Lewra me dît heke çi di encama dadgeheke dûr û dirêjheyam de, bi wî awayê ku dezgeha dadê dixwast, bi ronî û eşkere navê Weliyê Feqîh û berpirsiyarên din ên Komara Îslamî ku di wê pîlanê de dest hebûn û fermana vê cinayetê dabûn, bînin, lê bi curekê îşare bi heqîqet û rastiyê her hatiye kirin û heqîqeta han neçû bin perdeyê veşartinê. Ew bo cara yekemên bû ku bi wî awayî û bi wê qasê dezgeha teror û terorîzma Komara Îslamî bê rêtina areqeya şermê di wê mehrekê de bikare jiyana xwe derbaz bike û di asteke herî bilind a Komara Îslamî de ew rejîme bi dest têdebûn û destwerdan û birêvebirina wê terorê hate mehkûmkirin.

Îlankirina nûçeyê encama karê dezgeha

dad a Almanyayê, herçiqas tu demekê Dr. Şerefkendî û hevalên wî nevegerandin ji bo hembêza me, lê stemlêkiriya partiya me, gelê me û goriyên wê bûyerê ji hemû dunyayê re nîşan da. Vê yekê da xuyakirin ku çima Partiya Demokrat û rêberên PDKÎ ji bo rejîma Komara Îslamî armanc in û bi vî awayî pîlan û komplo ji wan re tên darêtin. Ew jî du Sekreterên Giştî ên partiyê li pey du komcivînên Enternasyonala Sosyalîst de pîlana han li ser wan bimeşe. Komara Îslamî heta wê qasê ji karê xwe û ji dan û standinên xwe, bi ceribandina Otrîşê ku heta ji vê çendê jî erxayîn bûn ku heta piştî komcivînên ES’ê ku hemû yan pirraniya rêberên cîhanê ên wê demê têde beşdar bûn û xwezayî ye ku nûçe û bûyereke wisa dê dengvedaneke berfireh hebe, lê bêy liberçavgirtina vê yekê rejêmî rast pîlan di wê demê de meşand. Lê di cihê xwe de, wî hukmî heta radeyekê dilê me rihet kir û tev azadîxwazan mohra riswa û rûreşiya ku ji aliyê dezgeha dada a welateke naskirî û demokratîk ê Ewropayê nav çavê rejîma Komara Îslamî da.

Dengvedana derveyî a wê biryarê çi bû? Me dît ku welatên endamên Yekîtiya Ewropayê bona nîşandana nerazîbûnê li hember vê liv û pîlana Komara Îslamî bi tevahî balyozên xwe ji Îranê vexwendin. Ew helwesta YE’ê her çiqas ne bi qasê bandora neyînî a wê tawan û cinayetê bû ku Komara Îslamî derheq bi neteweya Kurd û PDKÎ û rêberên wê partiyê encam dabû, lê di cihê xwe de her bi wê qasê jî bi bandor bû. Her çend ew balyoz piştre ji bo Îranê vegeriyan, lê em mêze kir ku helwesta han a YE’ê bûye sedem ku eger çi dezgeha teror û terorîzma Komara Îslamî ji kar nekeve, lê aliyê kêm li welatên Ewropayê weke berê nemeşe. Ewa rastiyekê diselimîne, ew jî eva ye ku çiqas Rojavayî micidtir û mikumtir li hember Komara Îslamî helwestê bigirin, bi wê qasê jî zêdetir dikarin wê rejîmê ji encamdana hinek kar û kiryarên ne durist û ne jêhatî biparêzin. Berevajî vê yekê, çiqas dan û standinên siyasî, dîplomasî û bazirganiyê pê re tên holê û çiqas bi nermî pê re dilivin û tevdigerin, bi wê qasê jî wê rejîmê di domandina cinayetan û liv û tevgerên ku encam dane, hartir û dirindetir dikin. Bi taybet niha ku Rojavayî bi tevahî an her yek bi radeyekê li hember Komara Îslamî û li hember serberedayîbûnên û wê balnedan ji raya giştî re ku li hemberî dinyaya derve rawestiyaye, çiqas micidtir serederiyê bikin, bi wê radeyê dikarin armancên xwe li hember Komara Îslamî de vepêçin, çiqas jî weke derbazbûyî û heta astekê jî wekî niha nermî û fidakariyê li hember vê rejîmê ji xwe nîşan bidin, divêt bi wê qasê jî piştrast bin ku di derbarê têkiliyên wan bi Komara Îslamî a Îranê de, xaleke erênî a cuda ji ya ku heta niha heye, dernakeve holê.

Mirov nikare bibêje ku Dr. Sadiq Şerefkendî ji keç û xortên demokrat re ne naskirî ye û yek ji me bikare nasînerê/a wî û hevalên din be. Kesên ku li ser jiyana berî hatin û tevlîbûna wî di nav refên PDKÎ agahdar in, dizanin ku çi di temenê zarokatiyê, nûciwanî û ciwaniyê û di dewrana xwendekariyê de mirovekî bilind bû û xwediyê hêz û şiyaneke zaf û zîrekiyeke taybet bû. Çiqas zû ji rêya rêberê me yê mezin, Dr. Qasimlo ve deriyê Partiya Demokrat a Kurdistanê bi rûyê wî hate vekirin û xebat û têkoşîna nepenî hebûye. Piştî aşkerabûna tekoşîna partiyê, piştî serkevtina şoreşa gelên Îranê, Dr. Sadiq Şerefkendî rolekî xuya û berbiçav di rêberîkirin wê partiyê de lîst. Ji xislet û taybetmendiyên wî, wefadariya sertaser tevî Dr. Qasimloyê nemir û rêbaza wî bû. Li hember wan kesan ku di meslehetê gelê Kurd û ji rêbaza rastîn a PDKÎ de pêyên xwe xwar danîban, gellek xurt û micid bû. Di karkirinê de pirr mikûr û di domandina karê rojane ê xwe de mandînenas bû. Di heman demê de xwediyê hestekî nazik bû. Hogirê helbest, wêje û muzîkê bû. Bi tevahiya wateyê însan bû, li gor naveroka sadiqane wekî navê xwe sadiq bû, lewra ji destdayîna kesayetiyekî wiha, ew jî kesê yekem ê PDKÎ ji me tevan re bi jan û keser e, lê renge ji bo rêberiyaq PDKÎ û yên ku berê jî di rêberiya wê partiyê de bûn, hem li Dr. Qasimlo û hem li Dr. Şerefkendî gellek bihîstine ku karek hatiye kirin, bêy vê çendê ku bi navê xwe kiribe ku me kiriye, ji ber ku heke rojekê ew jî nebe û ew jî nebin, ew partiye gihîjandine cihekê ku di wê rêyê de bimeşe ku wan jê re berpê danîne û ew wan erk û wezîfeyan bicî bigehînin ku li ser milê şagirtên xwe danîne.

Di vê derbarê de, bo cara yekemîn bû ku Komara Îslamî a Îranê cezayê xwe werdigirt, ne sûçê rastîn, lê her nebe cezayeke gellek ji we tawan û cinayeta ku encam dan. Demekê lewh û tabloyeke bibîranînê ji Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî li nêz cihê terorê tê danîn, taba vê yekê nake û gef û gurran dike û gefa vê yekê jî ji Almaniya dike ku di kiryareke wisa li Tehranê bimeşîne ku ji bo Almaniya nexweş û dilgiran e.

Em carek din ew rêberên me bibîr tînin ku em perwerde kirin û gihîjandin îro û partiya me gehand rewşekê û zerfiyetek jê re dan ku bikaribe heta musîbet û xem û derbên qurs weke ji destçûna wan jî tebat bike û li ser pêyan bisekine. Silavan dişînim bo canê paqij yê Dr. Sadiq Şerefkendî, kek Fetah Ebdulî, Humayûn Erdelan û Nûrî Dêhkurdî, nemaze ku dibînin ku wefadarî bi rêbaza Dr. Qasimlo di kelama Dr. Seîd de ku dibêje: “Em dê rêya te bidomînin, an emê serkevin yan em dê bihên kêleka te serê xwe danên” û aqibet rex wî jî serê xwe danî û bi soz û peyama xwe wefadar ma. Silav li tev şehîdên PDKÎ.

Serkevtin ji partiya wan re, serkevtin ji bo wan keç û xortên ku perwerdeyê destê wan in û îro ala partiya me ji destê wan hatiye wergirtin û ji bo wan bilind bû.

Serbilindî ji wan kesan re ku PDKÎ gihandin vira û serfirazî ji bo şagirtên wan jî ku çavnihêriyên wan di vê derbarê de bicî anîn.

Em îro di halekê de Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî bibîr tînin ku du rojan berî niha Kongreya Çardehem a Partiyê bi serkevtin ve bi dawî hat. Ew serûberiya ku di karê kongreyê de hebû û ew fezaya siyasî a zal bi ser kongrê û ew hilbijartina demokratîk ku di kongreyê de hate encamdan, erxayîn bin ku hemû evana dê riha rêberên me şa bike û dê ew soz û peyamane ji me werbigirin ku me ji wan re dabû ku xelata ew mezinahî û rola girîng a wan di Partiya Demokrat de hebû, ew jî domandina rêya wan e.

Heq e her salekê ku em bi vê hencetê qise dikin, rêz û emegdariya xwe hember dezgeha dad a Almaniyayê û parêzerên wê dosyayê bidin xuyakirin, ew kesên ku gef û gurrên Komara Îslamî nekarî wan li karê xwe dilsar bike, ew kesên ku bi haydan û li berdanîna temahiyê ji aliyê Komara Îslamî nekarî wan di erkekê de ku li hember heq û dadmendiyê girtibûn pêşberî xwe, bigêrineve. Em rêz û silavan ji bo dezgehên dad a Almaniya û parêzeran dişînin ku li Almaniya ew yek afirandin.

Silametî û temendirêjî ji wan re û em hêvîdar in partiya me dubare musîbet û karesateke wisa nebîne û birîna wiha giran hilnegire.

Gellek spas ji beşdariya we di wê rê û resma şîn û bi bîranînê de.


Dîmenek ji beşdarên rê û resma bibîranîna şehîdên Mîkonosê

# Hêviyek Mezin

**Azad Kurdî**

Dîroka siyasî a Kurdistanê tejî xedr û îxaneta dijminên Kurdan li hember keç û xortên wî gelî ye. Ji bilî kavilkirina gund û bajarên Kurdan, zilm û zordarî, asîmîlasyon û tunekirinê, girtin, îşkence û kuştina kurdan û wd beşek ji pêvajoya serkut û çewisandina gelê Kurd bûye. Lê yek ji metodên qirêj û gemar Şehîdkirina rêberên Kurdan bûye.

Rêber û kesayetiyên mezin û bilind di nav gelan de hêsan çê nabin. Di her civakekê û di nava her gelekê de, rêber rolek sereke, girîng û bi bandor di rêvebirin û pêşdebirina xebata wî gelî de dilîzin, lewra herdem yek ji armancên dijminên kurd û Kurdistanê, ji nav birin û kuştina rêberên Kurd bûye. Dîroka xebata siyasî û mafxwaziya Kurdistanê şahidê rastîn yê vê rastiyê ye. Heta niha bi vê armancê û bi mifahwergirtin ji metodên gemar, dehan rêberên Kurd hatine teror û Şehîdkirin. Armanca dijminan eva bûye ku bi lêdan û tunekirina mejiyên Kurdan – anku rêberan – pêşiya xebat û berxwedana azadîxwazî û berevanî ji mafên neteweyî bigirin.

Tevgera rizgarîxwaziya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê bi sedema meşandina vê siyasetê ji aliyê dijminan ve, çendîn rêberên leheng û navdar ên xwe ji dest dane. Di sedsala 20'an de, polîtîka han bi xurtî li ser gelê Kurd hate meşandin. Ji ber ku xebat û berxwedana Kurdan germ û gurr bûbû, di vê navberê de rêberên wek Simayîl Axayê Şikak, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û dehan rêberên din li pêşiya karwana şehîdên têkoşîna azadiyê di Rojhilatê Kurdistanê de bûn gorî.

Ji ber pêşengbûna PDKÎ di têkoşîna azadiyê di wê parçeyê Kurdistanê de, piraniya rêberên navdar û mezin yên şehîdkirî ên Kurd rêberên vê partiyê bûne. 3 rêberên navdar ên Kurd, Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî û herwiha dehan endamên din ên rêberiya partiyê, gorî û bedelên vê partiyê bûne ku jiyana xwe kirin qurbaniyê azadiya Kurd û Kurdistanê û hertim wek rûmet û sembolên gelê Kurd û PDKÎ hatine/tên hesibandin.

26'ê Xermanana 1387 (16'ê Îlona 2008)'an, 16'hemîn salvegera teror û Şehîdkirina rêberên navdar ê Kurd, Dr. Sadiq Şerefkendî, Sekreterê Giştî yê PDKÎ û hevalên wî: Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî û nûnerê partiyê li derveyî welat, Humayon Erdelan, berpirsiyarê partiyê li Almanya û Nûrî Dêhkurdî kesayetiyê siyasî ê Îranî û dostê gelê Kurd bû.



Di 17'ê Îlona 1992'an de, çend seet piştî beşdarîkirina şanda han a PDKÎ bi serokatiya Dr. Sadiq Şerefkendî di Kongreya Enternasyonala Sosyalîst de li Berlînê, dema bi komek kesyaetiyên siyasî ên Opozîsyona Îranê re civiyabûn, kete ber êrîşa terorîstên Komara Îslamî ku ji aliyê desthilatdarên herî payebilind ên rejîmê li Tehranê fermana wê terorê hatibû dayîn û bûne goriyên siyasetên terorîstperwerane ên vê rejîma gemar û Şehîd bûn. Armanca Dr. Şerefkendiyê nemir eva bû ku dixwast bi lidarxistina van cure civînane li Ewropayê, bi rêya gotûbêj û diyalogê yekîtî û hevbendiyeke xurt di navbera hêzên siyasî û neyarên rejîma Komara Îslamî a Îranê pêk bîne. PDKÎ herdem bawerî bi yekîtî, hevxebatî û hevgirtina hêzên siyasî ên dijberên rejîmê hebûye/heye, lê wê demê ji ber guhartinên navneteweyî û herêmî û heta guhertinên di asta hundirê Îranê de, ew pêwîstî zêdetir derxistibû holê. Lewra bi piratîk dest da xebat û gotûbêjê bona yekgirtîkirina hêzên Opozîsyonê da ku bi bername û pilatforemek hevbeş li dijî rejîma desthilatdar têkoşînê bimeşînin. Wê demê Dr. Şerefkendî pirr li ser yekîtî, hevxebatî û hevpêwendiya hêzên siyasî ên neteweyên bindest ên Îranê tekez dikir û weke hewcehiyeke giring û bi bandor dihesiband.

Me dît çendîn salan piştî Şehîdbûna Dr. Şerefkendî, rêvîngên rêbaza wî şagirtên emegdar ên Dr. Seîd, bi pêkanîna Kongreya Neteweyên Îrana Federal ew xewn û xweziya wî anîne cih û niha hêzên siyasî ên hemû gelên Îranê li dora hev civiyane û di çarçoveya vê kongreyê de xebata hevbeş birêve dibin.

Heke em bixwazin lênihêrîne kê li ser jiyan û serpêhatiya Dr. Şerefkendî bikin, divêt mirov her ji temenê zarokatiya wî re birame û binirxîne, ew yek hewcehî bi lêkolîn û dahûrandineke zaf heye, lê di vê nivîsarê de heke bi kurtî be jî, em dê basa rola wî rêberê zana û navdar di tevgera rizgarîxwaziya Rojhilatê Kurdistanê de bikin.

Dr. Şerefkendî di demeke pirr

www.arsivakurdi.org

hestyar de bû Sekreterê Giştî yê PDKÎ. Ji ber vê çendê ku ew xwediyê gellek taybetmendiyên bilind bû, piştî şehîdbûna Dr. Qasimlo wekî kesayetiyekî herî xwedî şiyan û karîn û şagirtekî emegdar yê Dr. Qasimloyê nemir, erkê rêberîkirina PDKÎ bigire stûyê xwe û nehêle ku valahiya mezin a nemana Dr. Qasimlo, rêbaza wî lawaz bike û dilê dijmin û neyaran şa be. Kesayetiya zanistî û akademîk, ceribînên siyasî û rêveberiyê di dema tevlîbûna wî di nav refên PDKÎ û xebitîn di kêleka Dr. Qasimlo û herwiha hesta şoreşvanî û welatparêziyê de, Dr. Şerefkendî kiribû yek ji rêber û hevreyên Dr. Qasimlo.

Her çiqas Dr. Sadiq Şerefkendî tenê ji bo dema sê salan Sekreterê Gitî yê partiyê bû, lê di wê heyamê de gellek baş kar û barên partiyê dimeşand û serkevtina wî pirr xuya û berçav bû. Rayedarên Komara Îslamî wisa difikirîn ku bi teror û Şehîdkirina Dr. Qasimlo, tevgera azadîxwaziya Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê û nemaze xebata PDKÎ dê rastî têkçûnê bihê yan dê pirr jar û lawa bibe, lê me dît ku Dr. Şerefkendî bona ku dilê dijmin û bikujên Dr. Qasimlo şa nebe û bi xewn û miraza xwe negihîjin, bi awayekî berfireh dest da organîzekirina kar û xebatên PDKÎ di hemû warên rêxistinî, ragihandin, dîplomasî û wd... û heta astekê valahiya Şehîd Dr. Qasimlo tejî kir. Di rastî de, her ew rola erênî û çeleng û bi bandor a Dr. Şerefkendî bû sedem ku desthilatdarên terorîstperwer ên Komara Îslamî bikevine fikra daw û pîlaneke din û wî sermayê mezin yê gelê bindest ê Kurd ji me bistînin û di vê yekê de jî serketin. Me dît, piştî Şehîdbûna Dr. Qasimlo ku Dr. Şerefkendî wekî cihgirekî jêhatî ê wî bû kesê yekem yê partiyê û hêviyeke mezin di nav dilê xelkê Kurdistanê û Kadro, Pêşmerge, alîgir û dostên PDKÎ û têkoşîna azadiya Kurdan li Rojhilatê Kurdistanê de pêk hatibû û pêşdebirin, ji nû ve organîzekirin û bihêzkirina PDKÎ dilê her dilsozekê ronî kirbû, ji me hate standin û di 17'ê Îlona 1992'an de car din ew cinayeta hov ji aliyê rayedarên Komara Îslamî li dijî rêberên PDKÎ hate meşandin ku, xem, kul û keserên birînên wê cinayetê terorîstî hêj sivik nebûye û heta bidestveanîn û misogerbûna hêvî û armancên Şehîdê navdar û nemir, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî û tev Şehîdên rêya azadî û demokrasiya Kurdistanê sivik nabin.

# Di Rê Û Resmeke Berfireh De, Dr. Sadiq Şerefkendî Û Hevalên Wî Hatin Bibîranîn

Bi armanca rêzgirtin û bibîranîna 16'hemîn salvegera teror û Şehîdkirina rêberê navdar ê Kurd, Dr. Sadiq Şerefkendî û hevalên wî: Fetah Ebdulî, endamê Komîteya Navendî, Humayon Erdelan, nûnerê partiyê li Almanya û Nûrî Dêhkurdî,



kesayetiyê siyasî ê Îranî û dostê Kurdan, roja sêşem, 16'ê Îlona 2008'an, rê û resmhêja û berfireh di binkeya Deftera Siyasî a PDK Îranê de birêve çû.

Rê û resm bi sirûda neteweyî ya "Ey Reqîb" û deqîqeyek bêdengî ji bo canê paqij yê şehîdên Mîkonusê û gişt şehîdên Kurdistanê dest pê kir.

Piştre Hesen Şerefî peyama rêberiya PDK Îranê bi vê hincetê pêkêş kir. Deqa payama rêberiay PDKÎ di paşkoya taybet a vê hejmara Agirî de hatiye weşandin.

Piştre peyamên Yekîtiya Jinan, Ciwanan û Xwendekarên Demokrta ên Kurdistana Îranê hatin pêşkêşkirin.

Her wiha di navbera beşên rê û resma han de, çendîn sirûd, helbest û pexşan bi vê hincetê hatin pêşkêşkirin.

Rê û resm piştî 2 demjimêran bidawî hat.

Her bi hinceta 16'hemîn salvegera şehîdkirina Dr. Şerefkendî û hevalên wî li bajarê Rojhilatê Kurdistanl ji aliyê endam û alîgirên nepenî yên PDK Îranê ve çalakiyên cur bi cur ên rêzgirtin û bibîranînê hatin lidarxistin. Di gellek gund û bajarên Kurdistanê de, trakt û dirûşmên taybet bi vê boneyê hatin belavkirin. Her wiha wêneyên Dr. Şerefkendî û hevalên wî jî bi berfirehî ji aliyê endamên nepeniyê partiyê bi awayekî berfireh hatin belavkirin.

## Beşek Ji Peyama Dr. Sadiq Şerefkendî Piştî Şehîdbûna Dr. Qaqsimlo Û Hevalên Wî Di Sala 1989'an De

**"EM WEKE PDK ÎRANÊ SERBARÊ VÊ ÇENDÊ KU BI KİRYAR HÊZA HERÎ ÇELENG A OPOZÎSYONA ÎRANÊ Dİ ÇEPERA XEBATA ÇEKDARÎ Dİ HUNDİRÊ ÎRANÊ DE BÛNE Û HENE, LÊ EM AŞTÎXWAZİN Û HEKE ME DEST Jİ BO ÇEKÊ BİRİYE, Jİ BO PARASTİNA XWE BÛYE, Jİ BER KU ŞER Bİ SER ME DE SEPANDİNE. EM Jİ ŞER Û XWÎNRÊJİYÊ BÊZAR İN, Jİ BER KU EM WATEYA ŞER Bİ BAŞÎ DİZANİN Û LEWRA EM HERDEM Lİ SER WÊ BAWERİYÊ BÛNE KU PİRSA KURD HETA BİGUNCE Jİ RÊYA AŞTÎXWAZANE VE ÇARESER BİKİN. LÊ KEVNEPERESTÊN DÛR Jİ MİROVAHÎ Û QAİLÊ SELÎM, Bİ VÎ KARÊ (TERORKİRİNA DR. QASİMLO Û HEVALÊN WÎ) HOV Û DİRİNDANE SELİMANDİN KU Jİ BO ÇARESERKİRİNA PİRSGİRÊKÊN ÎRO ÊN ÎRANÊ TU RÊYEKÊ Bİ NAVÊ RÊYA AŞTÎXWAZANE NAS NAKİN Û Dİ NAVBERA XWE Û XELKÊ ÎRANÊ DE TENÊ ZOR, TUND Û TÛJİYÊ Bİ REWA DİZANİN Û BES"**

# Bandora Xwendewariyê Li Ser Civakê

**Hemîd Muxtarî**
**Hemid83@yahoo.com**



Yek ji sedemên herî bingehîn ên pêşkevtina civakekê di warên aborî, pîşesazî, civakî, çandî, siyasî û...de di gava yekem de girêdayî bi asta xwendewariya wê civakê ye. Ger em mêzeyî welatên pêşkevtî ên cîhanê bikin, ev rastiya bêtir ji me re derdikeve holê.

Li gor serhejmariya herî dawiyê, 1 ji 5 a nifûsa cîhanê nexwendewar in. Helbet hêj tu pênaseyekê diyarîkirî ji xwendinê re nehatiye kirin. Renge di welatekê de xwendin û nivîsandina mijarek kurt weke pênaseya xwendewariyê bê hesibandin û di welatek din de kesekî/e xwendewar bihesibînin ku karkirin bi komputerê re bizane. Ew yeka gêrdayî bi çand û asta pêşkevtina teknolojî û zanistê di welatên cur bi cur de ye.

Saziya "UNESCO"yê, bi vî awayî xwendewarbûnê pênase dike: " Kesek ku bikare mijarekê hêsan bixwîne û binivîsîne û fam bike, xwendewar e. Herwiha di warê piraktîk de kesekî/ê xwendewar dizanin ku bikare di giştî çalakiyên ku di warê ektîvkirina bibandor ên girûpî û civakî yên civakê de beşdar be û ji xwendin, nivîsandin û şiyana xwe ji bo pêşkevtina xwe û civaka xwe mifahê werbigire. Kesek ku şiyanên han tune be, nexwendewar e. Çimku kesên han nikarin di civakê de xwedî bandor û çalak bin".

Mirovên nexwendewar li civakê di encamdana gellek karan de bê şiyan in û nikarin rola xwe a sereke bilîzin. Lewra rewşa aborî a piraniya kesên han ne pirr baş e. Heta ev yeka bandora xwe heya li ser aboriya giştî a welat jî. Ji aliyekê din ve nebûna xwendewariyê dibe sebeb ku takekes nekare di jiyana xwe a rojane de pêş bikeve û kesên nexwendewar tevî ew metod û bernameyên ku mirovên xwendewar bona çareseriya pirsgirêkên berdem jiyana xwe bikar tînin, nenasyar in.

Paolo Firîrê, derheq bandora xwendinê dibêje: **"Tenê xwendewarî ye ku dikare mirovan di jêr desthilatdariya dîktatoran de rizgar bike".**

Niha pirsgirêka nexwendewariyê pitir di welatên cîhana sêyem anku welatên Rojhilata Navîn û welatên kerta Afrîqayê de tê xuyakirin. Li gor serhejmariya ku di deqa proseya "Rojhilata Navîn" de hatiye: " Nêzîk %40 ji nifûsa bitemen a welatên Erebî, anku 65 milyon kes nexwendewar in ku du ji sê ya wan jin in. Herwiha pişka welatên Erebî di çap û belavkirina pirtûkên cîhanê de, tenê %1/1 e ku %15 ji wan jî pirtûkên olî ne. Eva jî di halekê de ye ku tenê hejmara pirtûkên ku bo ser zimanê Yûnanî tên wergerandin, 5 hemberî wan pirtûkan in ku bo ser zimanê Erebî tên wergerandin. Di halekê de ku tenê 11 milyon kes ji nifûsa cîhanê bi zimanê Yûnanî diaxivin.

Welatê Îranê jî yek ji wan welatan tê hesêb ku xelkê wê tevî pirsgirêka nexwendewariyê berbirû ye. Li gor serhejmariyên ku ji aliyê Tevgera Hînkirina Xwendinê li Îranê di sala 2006'an de hate belavkirin, nêzîk 8 milyon kes li Îranê bi tevahî nexwendewar in û asta xwendewariya 11 milyon kesan jî pirr kêm e. Yanî xwendewariya wan heya asta pola 4 a destpêkî ye. Bi giştî li Îranê 19 milyon kes yan nexwendewar in yan asta xwendewariya wan pirr kêm e. Eva tenê yek ji encamên 30 sal desthilatdariya rejîma Komara Îslamî di Îranê de ye!. Ji aliyekî din ve piraniya xwendingehên welatê Îranê xirabûyî ne û li hember erdhejê ne qahîm in. Di vê derbarê de **Hebîbulah Burbur**, Serokê Saziya Nûsazî û Kemilandina Xwendingehan di hevpeyvînekê de tevî nûçegihanê "IRNA"yê, ragihand: %60 ji xwendingehên Îranê li hember erdhejê nazik in û divêt ji nû ve bên çêkirin. Wî herwiha zêde kir û got: Mixabin salane pitir ji 5 milyon xwendekar li Îranê bi başî nahên perwerdekirin û 5 milonên din jî seba kêmbûn û du keretbûna xwendingehan, li cihê 6 demjimêran 4 demjimêran di xwendingehan de dimînin.

Desthilatdarên rejîmên dîktator vê yekê bi başî dizanin ku ger xelk xwendewar û zana be, ew êdî nikarin hukimdariyê bi ser wan de bikin. Lewra di pêşxistina xelkê xwe de gavên hewce hilnagirin ku Komara Îslamî a Îranê yek ji wan rejîman tê hesibandin ku gellek bi kêmî di welat de hewla ji navbirina nexwendewariyê daye.


Başe heke ne wisan be, çima divêt 19 milyon ji xelkê Îranê nexwendewar bin?

Îranek ku tenê di warê hebûna niftê di cîhanê de xwedî pileya sêyem e û nirxa her bermîlek niftê niha gihîştiye nêzîk 160 Dolaran. Lê mixabin desthilatdarên hakim bi ser welatê Îranê her rojê bi milyonan bermîlên petrola Îranê difroşine welatên cîhanê û bi perê wê çek û teqemeniyan dikirin da ku xelkê pê tepeser bikin, yan bona terorê yan destwerdan di kar û barên welatên cînar de bikar tînin yan didizin. Bi kurtî ev pere nagihîje destê xelkê Îranê.

Ji aliyekî din ve di sîstema şaş a Komara Îslamî de ger mirovên bi şiyan û xwendewar jî hebin, lê îdeolojiya desthilatdarên hakim bi ser Îranê qebûl nekin û dijberiyê tevî wan bikin, yan divêt ji wî welatî derkevin û herin bo welatek din yan dê bên kuştin. Heta gellek caran reviyan jî nikare wan ji mirinê rizgar bike û li derveyî welat jî dikevin ber êrîşa terorîsên şandî ji aliyê Komara Îsalmî û tên kuştin.

Di dawîyê de divêt bê gotin ku hewce ye girîngî bi perwerdehiya mirovan bê dan. Jin, zarok, pîr, ciwan, hemû û hemû divêt bi xwendinê bikarin di jiyana xwe de serkevin û xizmetê bi pêşveçûna civakê bikin. Xwendin jiyana mirovan diguhere. Tevî zanabûna mirovan gişt deb û edetên kevn û premayî hêdî hêdî di civakê de ji nav diçin û civak ber bi pêşkevtin û nûsaziyê dimeşe.

## Navendên Ewlekariyê Gefê Ji Mamostayên Kurdistanê




Komîteya Piştevanîkirin ji Gireva Birçîbûna Mamostayên Siyasî û Sivîl yên Kurd ragihand: Di yekemîn rojên sala nû a xwendinê de, berpirsên dewletî ên rejîma Komara Îslamî hewlê didin da ku ew mamostayên ku çalakiyên senfî û sivîl encam didin, bixin bin zext û givaşan.

Li bajarê Şinoyê îdareya Ewlekarî û parastina îdareya perwerde û hînkirinê, bê tu sedemek rohn, gefê ji mamostayên Kurd dikin ku ger çalakiyên sivîl encam bidin, dê doza ewlehiyê li dijî wan were vekirin. Li gor rapora ku gihîştiye destê Komîteya han, hejmarek ji mamostayên bajarê Sine ji rêya kesek bi navê **Xezal Merdî** ve ku niha berpirsê îdareya perwerde û hînkirina yek ji deverên vî bajarî ye, bo îdareya ewlekariyê hatine bangkirin. Di vê bangkirinê de li dijî mamostayên ku çalakiyên sivîl encam didin, doza ewlehî hatiye vekirin. Piraniya wan mamostayan bi buxtana hebûna pêwendiyê tevî partiyên siyasî ên dijî rejîma Îranê hatine tawanbarkirin.

## Navenda Parastina Mafê Mirovan Daxwaza Piştgirîkirin Ji Zîndaniyên Girevgirtî Ên Kurd Kir



Navenda Parastina Mafê Mirovan li Îranê di daxuyaniyekê de, daxwaz ji gişt jin û mêrên azadîxwaz yên cîhanê kir ku piştevaniyê ji girtiyên Kurd ên ku dest dane gireva birçîbûnê bikin.

Navenda han her wiha daxwaz ji karbidestên pêwendîdar yên rejîma Komara Îslamî a Îranê kir ku daxwazên berheq ên yasayî yên zîndaniyên girevgirtî li berçav bigirin û bilez îznê nedin canê girtiyan bikeve metirsiyê.

### Rejîma Îranê Li Dêwulanê, Alîkariya Firoşerên Madeyên Sirrker Dike



Rejîma Komara Îslamî a Îranê li bajarê Dêwulanê, alîkariya firoşerên madeyên hişber dike û amade nîne kesên han binçav bike.

Her di vê derheqê de du kes bi navên Hebêbulah û Nasir ku kirêgirtiyên navendên sîxorî ên rejîma Îranê ne, di bin navê nanfiroşiyê, di şeqama "Îstiqlal" a bajarê Dêwulanê de, madeyên hişber difiroşne zarokên temen 10 û 12 salî.

Kiryara han tevî bêdengiya navendên întizamî yên rejîma desthilatdar li Îranê berbirû bûye û bi tu awayekî pêşî ji wan nahê girtin.

# Xizanî Gefê Li Jiyana 1 Milyar Û 400 Milyon Mirovan Di Cîhanê De Dike

Li gora rapora herî nû a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî, rewşa nebaş a aboriya cîhanê pêvajoya xizanî û belengaziyê xurt kiriye. Li gora zanyariyên nû ên vê rapora NY, hejmara xizanan di welatên di halê pêşdeçûnê de ji 1 milyar û 400 milyon kesan jî zêdetir bûye. Rapora NY destnîşan dike ku xizanî û destkurtiya vê hejmara mirovan, dide xuyakirina ku newekhevî di herêmên cuda cuda ên cîhanê de jî heye. Li başûrê herêma newala Afrîqayê û welatên serbixwe ên Asyaya Navîn, hejmara xizanan di navbera salên 1990 heta 2005'an zêde bûye.

Ev rapore destnîşan dike ku berevajî pêvajoya berê a kêmbûna hejariyê di cîhanê de, çavnihêrî tê kirin jordeçûna buhaya alavên xwarinê xelkê zêdetir ber bi xizanyê bibe û hejmara han bêtir bibe, nemaze di wan deverên cîhanê de ku me qala wan kir.

Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî, Ban Kî Mon dibêje, jarbûna aboriya welatan gefê li jiyana xizanan dike û kêmbûna radeya pêşdeçûna aboriyê dahata hejariyê ji nav dibe. Kirîza xwarinê, hejmara birsiyan di cîhanê de zêde dike û bi milyonana mirov ber bi xizaniyê ve diçin. Li ser vê mijarê, roja 25'ê Îlona 2008'an, li avahiya RNY de konferanseke mezin bi beşdariya 100 serokên cîhanê hatin lidarxistin û pirs nîqaş kirin.

**Rojeva Civakê**

## %80 Ji Zarokan, Seba Hejariya Malbatî, Neçar Bi Karkirinê Dibin

**Agirî- Beşa Civakî**

**Zarok Bûne Goriyê Modernîzmê**

Piraniya kesên ku karên gulfiroşî, boyaxlêdan, pufdankfiroşî, paqijkirina rê û xiyewanan û... dikin, ji wan zarokan pêk tên ku di temenê 5 heya 15 saliyê de ne. Temenê tu yek ji wan jordeyî 15 saliyê nîne. Lê bona dabînkirina debara jiyana malbatên xwe, neçar in ku dest bidin karkirinê. Piraniya zarokan, seba rewşa nebaş ya aborî a malbata xwe neçar in ku di wan kargehan de kar bikin ku kêmtir dikevin jêr çavdêriya dewletê. Dema ku kargehên han ji aliyê dewletê ve dikevin ber lêgerînê, xwediyên kargehan bona vê çendê ku hêza kar yan erazan ji dest nedin, yan neçar bi dana perê bîmê nebin, zarokên ku wan re kar dikin, diveşêrin.

**Yasaya Karkirinê, Yasayek Bîhanî Ye**

Zêdebûna hejmara zarokên ku di sira zivistanê û kela havînê di xiyewanan de kar dikin, yek ji kirîzên bingehîn in civaka me tê hesêb. Hejmarek ji wan zarokan ku rojane 12 demjimêran di kargehên biçûk di Îranê de kar dikin, mehane tenê 30 heya 40 hezar tûmenan weke heqdest distînin ku dirav û miaşeke herî kêm e.

**Kargehên Taybetî, Bihêztir În Ji Qanûna Karkirinê**

Çend milyon zarok li Îranê kar dikin, li halekê ku madeya 79'an a yasaya karkirinê, karkirina zarokên jêr temenê 15 saliyê qedexe kiriye. Herçend ku di vê madeyê de karkirina zarokan hatiye qedexekirin û heta di peymannameyên cîhanî de jî tekez li ser vê yekê hatiye kirin, lê dîsan jî em dibînin ku hejmara zarokên xiyewanî di Îranê de roj bi roj zêdetir dibin.

**%80 Ji Zarokan Seba Xizaniya Malbatan, Neçar Bi Karkirinê Dibin**

Bi giştî %80 ji zarokên ser rêyan, seba desttengiya malbatên xwe di warê aborî de, neçar dibin ku dest bi karkirin di ser rêyan de bikin. Piraniya wan zarokan di parêzgehên weke **Kurdistan**, **Loristan**, **Xorasan** û **Tehranê** de ne. %90 ji zarokên han xwedî malbat in û %78 ji wan jî nêr in.

**Sedema Jordeçûna Hejmara Zarokên Ku Kar Dikin**

Fasîleya çînayetî, zêdebûna hejmara malbatên bê malxê (serperest) yan tek malxê yan xwedî malxêyan xirab, zêdebûna nifûsê, feqra çandî, koçberî, bêkarî, bengdarbûna endamên malbatê bi madeyên sirker û...sedemên bingehîn ên jordeçûna hejmara zarokên ku di xiyewanan de kar dikin, in.

www.arsivakurd.org

# DESTHILATDARÎ



ADAR JIYAN
adarjiyan@mynet.com

Li gorî çavkaniyên dîrokî û pesn û fortên nîjadperestiya dîrokzanên desthilatdar;

Şahînşahiya (împaratoriya) Osmanî, li ser sê çarzemînên dinê yên berfireh, zêdeyî şeş sed salî rêveberî û desthilatdarî domandiye û hukim kiriye. Dûgela Osmanî li ser van hersê erdzemînên kevnar, bûbû xwediyê kevneşopiyeke pireçand, pireol, pireziman û pirenetewe.

Ji Rojhilata Navîn bigirin heta Evropaya Navîn; ji Kafkasyayê bigirin heta Afrîkaya Başûr; ji Balkanan bigirin heta Mezopotamyaya Jêrîn û Jorîn, hemû wêran û vekiran kiribû. Belê li ser navê zanist û zanyariyê tu havil nekiriye bi navê şaristaniya gerdûnî tiştek nedaye mirovahiyê. Deremek çiye, fêd û sûdeya wê li cîhanê nebûye. Çimkî armanc ne aramiya mirov û berjerwendiyên mirovahiyê bû. Hemû hewldan ji bo ezîtî û ezperestiya kevneperst û paşverû bû.

Îro jî wisa ye. Desthilatdarî tu dem û dewranan xema mirov û mirovahiyê naxwe û nexwariye. Her gav di berjewendiyên xwe yên kesane û mêtingeriyê de difikire. Do Împaratoriya Osmanî çi bû, îro DYA (Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê) jî ew e. Do Dewleta Alî Osmanî bi navê vêkiranan dinya wêran dikir, îro jî DYA'yê bi navê aştî û demokrasiyê cîhanê tarûmar dike. Nav, dem û sedemên desthiladariyê guheriye. Belê peywir, feraset û armanc qet neguheriye.

Ji ber ku Dûgela Osmanî ji aliyê padîşah ve dihate birêvebirin û her wiha padîşah wekî xelîfeyê îslamê dihate dîtîn û pejirandin, nasnameya wî ya konevanî û olî bi hev û din ve hatibû cebirandin. Padişah hem dikaribû li ser navê şahînşahiyê û hem jî li ser navê Xwedê û pêxemberê wî peyamanan bide gel û wî di bin fermana xwe de bide xebitandin. Desthilatiya navendî, ji bo mayîndetiya dûgela mezin (Dewleta Alî Osman) û desthilatdariya padîşah, ji evdîtiyê pê ve tu tişt layîqî mirovan (hemwelatiyan) nedidît. Şer, kuştin, talan, mirin, jiyan di destê padîşah de; kar, ked, xebat, xurek û vexurek jî di suxreya padîşah û malabata wî de bûn. Îro jî teknolojiya nûjen û hemû alavên şer di suxreya DYA'yê de ne. Ango rewş zêde neguheriye.

Di dema Qanunî Sultan Suleyman ê ku 47 salan padîşahiya dewleta Osmanî kiriye de, li Fransayê reqsek îcad dibe. Li gora agahiyên demê reqs ji aliyê jin û mêrên fransî ve tê lîstin. Belê ji ber ku welatê fransiyan hemsînorê dewleta Osmaniyan e, Sultan Suleyman vê yekê bi xwe nexweş tîne. Bi hêrs radibe du qasidên xwe kar dike û nameyekê ji Qeyserê Fransayê (Fransuwa) re dişîne. Di nameya xwe de dibêje : " Li gora agahiyên ku gihîştine ber destê min, li welatê te reqsek nû îcad bûye. Tê gotin ew reqsa ku we îcad kiriye, tew ji aliyê jin û mêran ve tê lîstin. Ango qîz û xortên we yên ciwan dikevin destê hev û din û xwe li ba dikin... Wekî ku tu jî dizanî welatê te hemsînorê welatê min e. Û ew dab û nêrîtên we yên neqenc tesîreke neyînî li welatê min dike. Dibe ku bi vê reqsa we ya nû re, sinc û exlaqê hemwelatiyên min xera bibe. Ji ber wê divê tu wê reqsê li welatê xwe betal bikî û dev ji wan kirêtiyên dereolî berdî. Heke tu di hundirê mehekê de wê reqsê radîkî, rake; hekena ezê tevlî artêşa xwe bêm; te û artêşa te bihelikînim û welatê te mehf bikim..."

Li gora çavkaniyên dîrokî, tê gotin ku qeyserê fransî, wê reqsê ji welatê xwe radike û heta ku Qanûnî Sultan Suleymanê Osmanî namire jî tu kes nema diwêre li welatê fransiyan behsa reqsa jin û mêran bike.

Îro DYA'yê jî, li hember gel û neteweyên cîhanê bi heman helwest û ferasetê tev digere. Desthilatdarê dinê, dixwaze tevê cîhanê tevlî gel û neteweyên wê di bin desthilatdariya xwe de bihêle û di suxreya xwe de bide xebitandin. Li kîjan devera cîhanê dengê aştî û azadiyê bilind dibe, DYA'yê û desthilatdariya wê, wê deverê wekî qada terorîzmê û gelê wê jî wekî terorîstan nîşan dide.

Divê baş bête zanîn ku hemû dûgelên serwer û dagirker û desthilatdariya dinê ne di heyra mirov û gelan de ne. Derdê wan bêtir talan, kuştin û wêrankirina gelan û welatê wan e. Ji ber ku îro ew hêzdar û desthilatdarê dinê ne, çavê wan ji kû/kê bibire êrîşî wir/wî/ê dikin.

Ol û îmana desthilatdariyê nîn e. Cih û war, dem û dewran, ol û bawerî, nîjad û neteweya wê çi dibe bila bibe, dijminê mirovahiyê ye. Ew, do wisa bû; îro wisa ye; dê sibê jî wisa be !

*Kaniya Helbestan*

# Dilê Şeyda

**Ehmedê Xanî**

Disan dilê Şeyda ji nû, da îxtîyar perwazî kir
Seydek dîye ber daye dû, meyl û fira Şehbazî kir
Meyla wî mehza hîkmet e, Şeyda wî enqa Şîret e
Teyrê wî bala hîmmet e, lewra teleb efrazî kir
Enqa bi dest kes nakevit, damek divê ew dakevit
Nabit ku xafil rakevit, yê qesdê seyda bazî kir
Şeyyadiya min bû ebes, daîm li min teng bû qefes
Rahet benûm ez yek nefes, min lew bi efxan sazî kir
Saz û semaya suhbetê, govend û çerxa de'wetê
Fikrîme Şekl û qametê, bîr têne mi-b awazî kir
Şeklê mecazî çendek e, Şeyda heqîqî werdek e
Teyxûnê qeyda lê veke behrê, me ber endazî kir
Zincîr dibe teyxûn bitin, cendek li pêsber xûn bitin
Şunqar ne dê mecnûn bitin, uskûf ji çavan bazî kir
Şunqarê çav teyxûnê dil, berdane dû çavên bi kil
Xanî! Ewan gêra xecil, lewra mecaz axazî kir

# Serwa me

Serwa me bi sed reng û hezar îŞwe û meŞ hat
AŞiq kirin Îhya li reqîban ku nexweŞ hat
Sunbul kemilandin, Gul û lale xemilandin
Reyhan Şetilandin, li gulan taze binefŞ hat
Ten derve nebû qet, nedida bextê kuŞadek
Rû da me Şukur! Ke'be yê talî' me du ŞeŞ hat
Pê dane firengî i nîlo, hatine romî (Peydane)
Şukrane, nihane ji ereb hem ji hebeŞ hat
ReŞtozê xwe Nûbar e meger koŞe dixwazin
Tîra koŞeyî da te, hedef girt û bi keŞ hat
Yan hat bi nava dilê ket, qet nediwesta
Lewra ku ji ber qewsê me dî zêde bi weŞ hat
Xanî! Bese bê arî, çi ra zêdeyê salan
Îsal e ji xwe talî' û bextê nebireŞ hat

www.arsivakurd.org

Dengê Rojava



# Helbestvanê Kurd Şêx Memdûhê Birîfkanî (1911-1976)

**Besam Mistefa**

**"Ez feqiyekê belengaz im ji feqiyên Dîwana Cizîrî"**
**Şêx M.Birîfkanî**

Ji dema yekem helbestvanê Kurd Baba Tahirê Hemedanî-`Uryan-heta bi helbestvanên nû, qada helbesta kurdî bi hest û nest, hêvî û azwer û xwîna helbestvanan hatiye rengînkirin, xemilandin. Bi taybetî helbestvanên me yên kilasîk yên ku xweza û bedewiya kurdistanê di helbestên xwe de, pesin kirine û nemir hiştine. Şêx Memdûhê Birîfkanî yek ji wan helbestvanên ku ji baxê helbesta kurdî ya kilasîk çêj wergirtiye û ji kaniya herikî ya Melayê Cizîrî û Feqê Teyran vexwariye. Kurdistan bi hemû bedewiya xwe di helbestên wî de, rû dide, û milletê kurd û zimanê kurdî tê pesindanê.

**Jînenîgariya Şêx Memdûhê Birîfkanî (1911-1976):**

Şêx Memdûhê Birîfkanî di sala 1911'ê Zayînî li–Badê-ya ser bi–Dihokê- hatiye ser rûyê dinyayê. Di heft saliya xwe de, dest bi xwendina Quranê kiriye. Xwendina xwe ya olî li Birîfka li ber destê Mela Ebdullahê Etrûşî sê salan xwendiye. Piştre, li–Sipîndarê-dora salekê li ber destê Mele Ebdulxaliq Akreyî xwendina xwe berdewam kiriye. Piştre, li–Etrûşê-li ba Şêx Ebdulrehmanê Etrûşî bicî bûye, û li ber destê Hecî Mela Ehmed xwendiye. Ji Etrûşê jî, berê xwe daye-Kemeka-û dora du salan li ba Îsayê Salihê Kemekî xwendiye. Di sala 1931'ê de, xwendina xwe bidawî aniye. Piştre, li Zaxo li ber destê Mela Ebdulxaliqê Akreyê bawernameya 12 ilman wergirtiye û vegeriyaye Birîfkayê. Piştî ku Şêx Memdûhê Birfîkanî îcaza xwe li ber destê Mela Ehmedê Akreyî werdigire, di heman salê de îcaza Terîqeta Qadirî ji destê Şêx Mihemmed Rizwanî digire. Ji bilî vê, wî li Bexda û Necefê jê fêrên ayînî wergirtine.

Şêx Memdûh du jin anîbûn. Li Zaxoyê, sala 1938'an keça Yusif Paşa, xûşka Hazim Begê li xwe mehr kiriye, û di sala 1954an de jî keça Mela Mihemmedê kurê Ebdulxaliqê Akreyî mehr kiriye. Şêx Memdûh du caran çûye Heccê.

Di sala 1970'ê de, Şêx Memdûh dibe endamê komîteya birêvebir ya nivîskarên Kurd. Her weha, yekem serokê Yekîtiya Nivîskarên Kurd-tayê Dihokê. Ji bilî vê, ew endamê Korrî Zaniyarî Kurd bûye. Şêx Memdûh di hindek helbestên xwe de, xwe bi (Exlatî) nîşan dide. Û Exlatî naznavê Şêx Memdûhê Birîfkanî bû. Exlat navê bajarekî Bakurê Kurdistanê ye. Şêx Memdûh ji malbata Şêx Ehmedê Exlatî ye.

Helbestên Şêx Memdûh di gellek kovar û rojnameyan de hatine belavkirin, weşandinê, weke kovara Ronahî-Hawar-Birayetî, Nûserî Kurd-Kirêkaran û di rojnameya–Bizav-.

Diyar e ku helbestvanê me yê hêja Şêx Memdûhê Birîfkanî ji zaroktiya xwe ve, hez ji edeb, wêje û helbestvaniya kurdî kir. Bandora kilasîkên Kurd–Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Melayê Bateyî..hwd, ser şîira wî berz û diyar e. Şêx Memdûh xwe mîna "feqeyekî belengaz ji feqeyên Dîwana Melayê Cizîrî" dihijmart.

Şêx Memdûh di nîsana sala 1976'an de, çû ser heqiya xwe û li bajarê Dihokê hate veşartin.

Gencîneya şîir û helbestên Şêx Memdûhê Birîfkanî mezin û berfireh e. Bi evîn û hezkirin, kurdewarî û ruhê nîştimanperweriyê û eşq û heza Kurdistanê xemilandî ye. Şêx Memdûh kurdperwer bûye û ew sitemkariya ku hatiye serê milletê wî, nepijirandiye. Zimanê Şêx rewan e û mîna çem û robarên Kurdistanê, wisa zelal, wisa paqij, diherike. Lê, her çawa be jî, ruhê netewayetî li nik wî dabû ser aliyên dinê jiyanê. Şêx bibû fida û girêdayî doza gel û welatê xwe û helbestên xwe terxan dikirin ji bo ax û xwezaya Kurdistanê di gel helbestên ku di nava xwe de nêrîn û felsefeya wî vedihewînin. Her weha, wekî zanayekî kurd hiştin û parastina ziman û edeba kurdî jî weke erkeke xwe didît, û di vî warî de ferhengeke kurdî-kurdî di gel helbestên xwe di dîwanê de, dide çêkirinê. Şêx dibêje ku: "pêdivî ye em li edebiyata xwe miqate bin, her dem di hizra me da bit, wê ji hindabûnê biparêzîn". Hilbet, ev nayê wê wateyê ku, Şêx Memdûh dûrî ol û dînê xwe ketibû, lêbelê wî hezkirina ol û netewayetiyê bi hev re fêrî feqe û mirîdên xwe, dikir. Belê, Şêx Memdûhê Birîfkanî mirovekî hestyar û nefisbiçûk bû. Cîhana wî ya helbestvaniyê bi dostanî, hezkirin, ayîn û nîştimanperweriyê dagirtî bû, ji bilî şahîkiya zimanê wî yê kurdî. Bê guman, ev hestên Şêx Memdûh yên neteweyî û welatparêziyê bûne sedema zindankirina wî û derengketina çapkirina helbestên wî yên ku bi kêmî di hindek kovar û rojnameyan de li Îraqê hatibûne weşandin, weke rojnameya "Welat" û kovara "Nûdem"-Karwan-Beyan-Rewşenbîrî.

Şêx Memdûh mirovekî aqilmend û bîrwer bû. Mirov, bi zimanê xwe yê xweş û rûyê xwe yê geş êsîrê kesatiya xwe dikirin, nexasime ku malbata wî-Birîfkanî-li deverê bi tundî tê hezkirin û qedirgirtin. Şêx Memdûhê Birîfkanî lêkolînên giştî ser edeba kurdî-zaravê behdînî-dikir û di wêjeya erebî de jî, xwedî zanayî bû.

Weke berê jî hate gotin, Şêx Memdûhê Birîfkanî, li ser şopa helbestvanên kurd yên kevin–kilasîk-bi taybetî M.Cizîrî û F.Teyran, helbesta xwe dihûnand. Şêx Memdûh bi şêwaza nivîsandina xwe gellek ji wan ve nêzîk bû, û her di warê ayînê de jî wekî wan olperest bû, û bi navê olê li piraniya dever û parçeyên Kurdistanê geriyaye. Her weha, Şêx gellek gotinên kurdî yên kevin sax û zindî kirine û di helbetsên xwe de bikar anîne, di gel ku wî şîir û helbestên gellek helbestvanên kurd yên kevin kom kirine û ji windabûnê parastine tevî ku gellek ji wan hîn nehatine weşandin, ne ketine ber ronahiyê de.

Di derbarê Şêx Memdûhê Birîfkanî de, Sebrî Botanî wiha dinvîsîne: "Şêx Memdûhê Birîfkanî di edebiyata me ya kilasîk de navekê girîng e".

Bê guman gera Şêx li piraniya bajar û gund û deverên Kurdistanê bû alîkar ku zimanê wî yê kurdî xurt û bihêz bibe û gellek zaravên kurdî di helbestên xwe de bikar bîne, û peyvên kurdî yên resen ji gencîneya ku dabû hev, derdixistin, û dikirin rist û hozan di pesindana xweza, xurista Kurdistanê de. Reşîd Findî behsa hunera helbestê ya Şêx Memdûh Birîfkanî dike û dibêje: "Hozanêt Şêx Memdûh Birîfkanî di ter û nazik û ciwan in, û rehwaniyeka hunerê hozanê û şarezayiya zimanî lê diyar dibît".

-Berhemên Şêx Memdûhê Birîfkanî:

1-Laleşîn:beşê yekê ya dîwana wî-1997, Stockholm, çapxaneya APEC.
2-Ferhenga Birîfkanî:di sala 1950 î de hatiye nivîsandin. Kurdî-Erebî ye. Kurdiya wê bi herdû tîpên erebî û latînî ji aliyê Şêx Memdûh ve hatiye nivîsandin.
3-Berhevkirina dîwana Şêx Nûreddînê Birîfkanî (1940-1966).
4-Berhevkirina dîwana Şêx Şemseddînê Qutbê Exlatî yê Birîfkanî(1940-1966).
5-(El Heqîqe wel Beyan fî tercumet sadat Birîfkan) bi zimanê erebî .1961.
6-Pêncî û yek helbestvanên kurd.
7-Lîsteya dara malbata Birîfkaniyan.
8-Gelek gotar û çîrok û metelok û lêkolînên ser dîroka milletê kurd.

Helbest:

Welatê me
Şax û daxên di wilatê me pir e ji şengebiya
Çîçek û alal û beybûn qul bi qul ketine çiya

Nêrgizên ser di giran şermendê xemla te ne
Li çîmenên nazik û ter simbil diden aweriya
Sorgulên sîmayê rengîn li terzina girtî xunav
Daxedar im bo binefşên xurmeî li ber keviya
Çar kinarê keviya sosin û simbil xemilîn
Mêrg û baxên di beheştê didine ber çikiya
Heçî coma tu binê bexçeyê rizwan e wilat
Baxê Îrem te hebît dê bideye mizgîniya
Mirîya bînî lê danî sê şevan dê jêne ve
Her dema binêrî bihare kanî nûjdare giya
Ax ji zêr e li çiya binêre dur û almas in hemî
Çendî cewher cumla yekser wê ji nikme çûn ciya
Rez û bax û çîmenan şalîl û balîl dixwînin
Deng û awazê şirîn kefte nihal û geliya
Kan û gencên di wilatê me pir in mil dane yek
Sed hizar in tev bijar in makê kîmya ye giya
Serwerê çendî cihan heq bêguman erdê me ye
Bi qurçeka avê ji dola sax diken bêvariya
Heçî vî erdî bibînît paşî jê bene derê
Şêt dibît hadir di gavê dîn û har kefte riya
Bes bibêje kêm birêje Exlatî nas î ji mêje
Cih biheşt e çiya û deşt e av iheyat e li kaniya
Hilo Rabin
Hilo rabin gelî Kurda bi can û mal bi ehd û soz
Binêrin faris û tirka li me napirsin ereb û rûs
Ji tirka ya me bû erd û hemî rêze hemî Tersûs
Hekarî û Tuncelî û Mereş Kemîşxane heta Toros
Hinek Qeyserî û Sêwas û hinek Toqat hinek Mêrsîn
Exne û Dêrsim û Entab, Qerehisar û Artwîn
Bîngol û Şirnex û Cizîrê û Exlat û Mafarqîn
Sêwreg û Wêranşehir û Batman û Dara û Nisêbîn
Melatya, El ezîz, Xerpût, Giresun û Adîyeman
Qerekose û Trebzon û Bazîd û Qers û Erdûxan
Urfa û Sêrt û Erzerom, Bidlîs û Mûş û Erzincan
Îslahiye û Îskenderûn, Diyarbekir, Mêrdîn û Wan
Eve hemî kurd bûn xurî zarî di kirmancî dixwand
Man bêxudan û bêxweyî lewra ku tirka ji me revand
Exlatî hindî ba dikir trika cihê me ji xu kirand
Kesê çi pisyar lê nekir derd û xema dil peritand

**Jêder:**
-Dîwana Şêx Memdûhê Birîfkanî, berhevkirin û amadekirina Zahid Birîfkanî,çapa didiwan, dezgeha Aras-2002.
-Dîwana Kurmancî, Ebdulreqîb Yûsiv.

# Ezîz Şarox Alîkariyê Dixwaze

**Ezîz Şarox: Bona tomarkirina panzdeh strananin, pêdiviya min bi hevkariyê heye.**



Li hevpeyvîneke taybetî de ku li bajarê Mehabadê hatiye encamdayîn, hunermendê Kurd Ezîz Şarox di derbarê berhemên xwe yên pêşerojê de got: Bona tomarkirina 15 stranan, pêdiviya min bi hevkariya sponsorek an jî alîkariya dezgehekê heye ji bo ku alîkariya min bike li warê maddî ve ji bo belavkirina berhemê.

Herwha got: Li nav van stranan de du stran bi awaz û helbestê ve yên min in.Ya yekem min ji bo bajarê xoşewîstê Mehabad gotiye û ya din jî berhemeke li ser koça dawiya hunermendê mezinê Kurd Mihemed Mamlê, berhemên din jî heman cûrene, lê belê ew panzdeh berhem gelek kar divêt, ji bo wê yekê min pêxweş e li Herêma Kurdistanê dezgehekî hunerî hevkariya min bike, eger ew dezgeh dezgeha Xak jî be gelek baştir e.
Di derbarê deng de jî got: Niha temenê min (70) sal e, lê belê gelek spasiya xwedê dikim ku tu guhertinek bi ser dengê min de nehayiye û tenê li demên derbasbûyî de bi meqama **Ey Lê Zalim** min dengê xwe ceribandiye ku ew jî meqamekî bilind e. Di encama vê ceribandinê jî bi başî berhem derket holê ku dikarim bi meqamê bilind jî stranan bibêjim.

## Hespên 64 welatan dê li Kirmaşanê hinerê ciwanî û rehwaniya xwe nîşan bidin



Bi beşdariya 64 welatan li Kirmaşanê festîvala navnetewî ya hespsiwariya kurdî tê lidarxistin. Rêveberiya kultur û kelepora Kirmaşan (Rojhilatê Kurdistan) ê ragihand ku ji bo nasandina hespên resen yên kurdî bi cîhanê dê 17-ê meha 10-ê festîvala hespsiwariya kurdî li bajarê Kirmaşanê destpê bike û dê 15 rojan dewam bike.
Rêveberê kultur û keleporê yê wîlayeta Kirmaşanê Esedula Bîraniwend got yek ji taybetmendiyên wîlayeta Kirmaşanê hebûna resentirîn rengên hespên cîhanê ye bi navê "Hespê resen yê kurd" ku li sala derbasbûyî ji aliyê navendên cîhanê ve weke yek ji resentirîn hespên cîhanê hatiye tomar kirin.
Wî her wiha eşkere kir ku bi bûna tomarkirina hespê resen yê kurd bi curekî ji curên hespên cîhanê, rêveberiya geştiyariyê biryar da dê festîvaleke cîhanî saz bike û got nêzîkî 100 milyon tumen ji bo encamdana wê festîvalê hatiye terxan kirin.
Di wê festîvalê de pêşbirkeya hespê resen yê kurd ji du beşan pêk têt: 1) Ciwaniya laşê hespên resenê kurd 2) Beşê hespsiwariyê li gundê Olompîkê yê bajarê Kirmaşanê.
Jêder: Nefel

www.arsivakurd.org

agiri

Rojnameya panzdehrojî ya siyasî, çandî û giştî
Partiya Demokrat ya Kurdistana Îranê diweşîne

http://www.kurdistanmedia.com/kurmanci/index.php
Navenda bingehîn ya xebata Agirî li Kurdistanê ye.
Navnîşana derveyî welat: AFK B.P. 102- 75623 Paris CEDEX 13 –FRANCE

E - Mail:
agiri2003@hotmail.com
agiri2003@googlemail.com



# Arjantîn Carek Din Daxwaza Mehkemekirina Rayedarên Îranê Kir

Kirîstîna Fernandez, Serkomara Arjantînê careke din tawana destêwerdana Îranê di teqîna salal 1994'an a Navenda Cihûyan li "Buenos airres" dubare kir û daxwaza mehkemekirina hinek ji rayedar û rêberên rejîma Îslamî a Îranê kiriye. Xatûna Fernandez ku di Civata Giştî a Rêxistina Neteweyên Yekbûyî de diaxivî, got: Ez ji Îranê dixwazim ku tawanbarên vê teqînê ji bo mehkemeyeke dadmendane û zelal û eşkerebûna rastiyên dozê radestî Arjantînê bike.

Di salal 1994'an de, otomîlek li cihê Navenda Cihûyan li paytexta Arjantînê teqiya û 85 kes kuştin û zêdetirî 200 kes jî birîndar bûn. Arjantînê Îran weke berpirsiyar û sebebkarê vê teqînê nas kiriye. Nêzîk du salan berî niha jî Dadwerek Dadgeha Federal ya Arjantînê biryara girtina 9 Îraniyan da ku di nava wan de Haşimî Refsencaî jî, Elî Felahiyan, Elîekber Wilayetî, Muhsin Rizayî - ku van 4 kesane di terorkirina Dr. Qasimloyê nemir de dest hebûn - û 4 kesên din, weke gunehkarên vê dosyayê nasand.

Dadgeha Federal a Arjantînê li ser vê baweriyê ye ku wan rayedarên payebilind ên Îranê bernama wê teqînê darêtine û ji rêya çend endamên Hizbulahê birêve birin.



# Hevdîtina Bi Girtiyê Kurd, Kebûdvend Re Hate Qedexekirin



Malbata Mihemedsidîq Kebûdvend, serokê girtî ê Rêxistina Mafê Mirovan li Kurdistanê (RMMK), diyar kir ku hevdîtin û serdana bi wî re hatiye qedexekirin. Di heyamê 15 meh binçavkirina wî de, malbata Kebûdvend tenê karîne carekê, ew jî bi qasê 20 deqîqeyan bi wî re hevdîtinê pêk bînin. Dema ku hevser, keç û 2 lawên Kebûdvend roja 24'ê Îlona 2008'an, dixwastin ji bo hevdîtina wî biçin girtîgeha ÊVÎN a Tehranê, berpirsiyarên girtîgehê bi sedemên neron berlêgirtinê ji hevdîtian malbata Kebûdevend bi wî re kirin. Ji ber vê helwestê, malbata Kebûdvend nerazîbûna xwe nîşan dan, lê memûrên rejîma Komara Îslamî bêrêzî û bêhurmetî bi wan kirin û heta li her du kurên wî yên kêmtemen xistin û gef ji wan xwarin û ew neçar man ku wir bicî bihêlin.

Di daxuyaniyekê de, RMMK'ê serbarê erêkirina vê yekê, ew biryar û kiryare li dijî girtiyê Kurd û çalakê mafê mirovan Mihemedsidîq Kebûdvend mehkûm û şermezar kir û li dijî hemû usûl, qanûn û pirensîpên mirovî û navneteweyî ;n maf; mirovan hesiband.

# Birayekî Girtiyê Kurd, Enwer Husênpenahî Hate Kuştin



Roja înê, 26'ê Îlona 2008'an, birayekî Enwer Husênpenahî, çalakê siyasî yê Kurd ê mehkûmbûyî bi îdamê yê herêma Leylaxê bi navê **Eşref Husênpenahî** ji aliyê hin kesên nenaskirî ve kete ber êrîşê û piştre meytê Eşrefê 33 salî di navbera gundên Tatereş û Qurîça de bi nîvecanî hate peydakirin. Lê roja şemî, 27'ê mehê bi sedema mirina mêjî di nexweşxaneyê de jiyana xwe ji dest da. Hêzên Ewlekariyê çend caran gef ji wî kiribûn.

# Qanûna Hilbijartinên Herêmî Li Îraqê Hate Qebûlkirin




Piştî çend mehan nîqaş û gengeşên xurt di navbera Kurdan û aliyên Şîî û Sunî ên Îraqê û gotûbêjên divê derbarê de, aqibet Parlemana Îraqê birayereke girîng da û qanûna hilbijartinên herêmî qebûl kir. Li gora biryara nû a Parlamentoya Îraqê, ji 18 eyaletan di 14'an de dê hilbijartin pêk bihê.

Di biryara berê de ku Kurdan bi tundî dijberî pê re dikir, tê de dihat xwestin ku parêzgeha Kerkûkê wekî herême xweser bi Bexdayê ve bê girêdan. Di qanûna nû de hatiye qebûlkirin ku hilbijartina li Kerkûkê paşde bikeve. Lewra ji bo Kerkûkê jî biryareke hate girtin. Li gor vê biryarê di navebra Kurd, Sunî û Şîîyan de dê komîsyoneke bê avakirin û ev komîsyon heta Adara 2009'an dê raporeke çareseriyê pêşkêşî Parlemana Îraqê bike.

**Mihemed El Beredeî:**

# "Rejîma Tehranê Li Pey Çêkirina Çekên Etomî Ye"



"Rejîma Tehranê dixwaze bi çêkirina bombeyên Etomî ewlekariya xwe zêde bike û bibe yek ji hêzên mezin ên herêmê". Eva cara yekemîn e ku Mihemed El Berdeî, Serokê "IAEA"ê bi eşkere li ser armancên Komara Îslamî ji bo berhemanîna çekên Navikî diaxive.

Rojnameya "Zod DW Seaton" a Almanya hevpeyvînek bi El Beradeî, Serokê Ajansa Vejena Etomê ya Navneteweyî weşand û wî got ku rejîma Tehranê ji bo bidestxistina çekên Etomî gavan davêje. Wî di rapora xwe ya vê dawiyê derbarê bernameya Etomî de jî bal kişandibû ser armancên vê rejîmê bona çêkirina çekên Etomî û dabû xuyakirin ku ev rejîme dixwaze bi çêkirina bombeyên Etomî ewlekariya xwe zêdetir ewle û garantî bike û bibe hêzeke mezin a herêmê.